Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1377 | 17-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Tedawiya Xwezayî û girîngiya wê di jiyana mirovan de

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Ji bo dûrketina ji tedawiya bi madeyên kîmyayî ku li kêleka sûdên xwe zerarê dighîne laşê mirov, di salên dawî de tedawiya xwezayî wekî alternatîf careke din derket holê.**

Di salên dawî de, cîhan şahidiya eleqeyek zêde ya bi tedawiya xwezayî re kiriye, armnc jî dûrketina I dermanên kîmayayî ye. Ev cure derman bûye mijarek navendî ya nîqaşê di navbera bijîşk, lêkolîner û nexweşan de, nemaze ji ber belavbûna nexweşiyên kronîk û stresên psîkolojîk ên jiyana nûjen. Tedawiya Xwezayî behsa komek pratîkên dermankirinê dike ku ne bi giranî li ser rêbazên bijîşkî yên kevneşopî ye, lê belê li ser karanîna giyayên xwezayî, masaj û rêbazên din ên ku armanc dikin hevsengiya di navbera laş û hiş de bi dest bixin.

### Kokên kevnar yên tedawiya xwezayî

Tedawiya Xwezayî bi hezaran salan vedigere, ji hêla şaristaniyên kevnar ên wekî şaristaniyên Çînî, Hindî û Misrî ve ji bo dermankirina nexweşiyên cûrbecûr hatiye bikar anîn. Mirovan ji bo dermankirina tayê, kulbûn û êşa laş xwe dispêrin şînatî û gihayên derman ên ji xwezayê hatine derxistin. Bi pêşkeftina dermanê nûjen di du sedsalên dawî de, eleqeya bi dermanê xwezayî re demekê kêm bû, lê di serdema nûjen de ji ber belavbûna zêde ya dermanên xwezayî, ew bi hêz vegeriyaye. Mînak, li Çînê tedawiya bi derziyan îro jî li nexweşxaneyan li kêleka dermanê nûjen tê bikaranîn, di heman demê de Hindistanî xwe dispêrin dermanê kevneşopî yê bi navê Ayurveda"ku balê dikişîne ser hevsengiya xurekî, psîkolojîk û laşî.

### Sedemên belavbûna Tedawiya Xwezayî

Çend faktoran beşdarî belavbûna Tedawiya Xwezayî bûne, ya herî girîng lêçûna bilind a dermankirina kevneşopî li hin welatan, herwiha tirsa hin nexweşan ji bandora dermanên kîmyewî. Medyaya civakî jî roleke girîng di parvekirina ezmûnên kesên ku ji dermanên xwezayî sûd wergirtine de lîstiye. Hin teknîkên Tedawiya Xwezayî jî dibin alîkar ku stres kêm bibe û rehetiya derûnî baştir bibe, nemaze dema ku bi dermankirina bijîjkî ya kevneşopî re were bikar anîn. Mînakî yoga dibe alîkar ku fikar kêm bibin û xewê baştir bikin, di heman demê de hin giya ji bo sivikkirina pirsgirêkên helandinê û serêşê têne bikaranîn.

### Gelek sûdên tedawiya xwezayî

Piştgirên tedawiya xwezayî bawer dikin ku ew di zêdekirina şiyana xwezayî ya laş de ji bo berxwedana li dijî nexweşiyan dibe alîkar, ji ber ku ew xwe dispêre teşwîqkirina parastinê û baştirkirina şêwaza jiyanê. Di nav sûdên wê yên herî berbiçav de ev in:

- Kêmkirina strês û fikaran
-Sivikkirina êşa kronîk
- Baştirkirina kalîteya jiyanê
-Xwe dispêre mikewinatê xwezayî

### Tedawiya xwezayî û tedawiya nûjen

Tevî sûdên ku gelek kes pesnê wan didin, tedawiya xwezayî bê rîsk nîne, nemaze dema ku bi şaştî an bêyî şêwirmendiya pispor were bikar anîn. Bijîşk hişyar dikin ku di rewşên giran ên wekî penceşêr an nexweşiya dil de tenê xwe nespêrin tedawiya xwezayî ji ber ku ev dikare dermankirina bijîşkî ya guncaw dereng bixe. Herwiha, hin giya dikarin bibin sedema tevliheviyên cidî ger bi rengekî ne guncaw werin bikaranîn an jî bi dermanên din re têkilî daynin. Ji ber vê sedemê, rêxistinên tenduristiyê tekez dikin ku pêwîst e ev sektor birêkûpêk were bikaranîn û ewlehiya berhemên xwezayî yên di sûkê de hene were misoger kirin.



Têkiliya di navbera tedawiya xwezayî û ya nûjen de divê ne têkiliyeke pevçûnê be, lê divê têkiliyeke hevkariyê be. Tedawiya nûjen xwe dispêre lêkolînên zanistî û ceribandinên dijwar, di heman demê de tedawiya xwezayî rêbazên piştgirî pêşkêş dike ku dikarin bibin alîkar ku rehetiya psîkolojîk û laşî ya nexweşek baştir bibe.

Bi pêşketinên bilez ên di warê tenduristiyê de, tedawiya xwezayî bala bi mîlyonan kesan li çaraliyê cîhanê dikişîne. Hin kes piştgiriyê didin wê wekî rêyek xwezayî ya bi bandor ji bo baştirkirina tenduristiyê, hinên din jî hişyariyê didin xetereyên wê dema ku bêyî çavdêriya bijîşkî tê bikar anîn. Di navbera van her du perspektîfan de, prensîba herî girîng hişyarî û nermbûn e û dûrketina ji şûna dermankirina bijîşkî ya pêbawer bi rêbazên zanistî yên nehatine îsbatkirin. Divê mirov ji pêşketinên bijîşkî yên nûjen sûd werbigirin û di heman demê de şêwazên jiyana tendurist û xwezayî yên ku piştgiriyê didin başbûna wan a laşî û derûnî biparêzin.

## FERHENGA BIWÊJAN

### LI SER KESÊ BERÊ JI PIŞT RE BAŞTIR

**Çû çakûç, vegeriya birek:**
- Berî ku biçe ji niha baştir bû.
**Çû derzî, vegeriya şûjin:**
- Bi heman wateyê.
**Heta piçûk in dibêjin hêk dema mezin dibin dibêjin qeqe:**
- Her ku diçe rewşa wan nebaştir dibe; berê ji niha baştir bûn.

### LI SER LEWAZBÛNA HIZIR Û HIŞMENDIYÊ

**Dinê li dinê çavê gur li bizinê:**
- Dema yek pir teng û piçûk dihizire wê demê jê re tê gotin.
**Dinya ne tarê bêjingê ye:**
- Wisa teng nefikire; bi nêrîna xwe tenê li mijaran nenêre; çareseriyên din jî hene.
**Di qula derziyê re li dinyayê dinêre:**
- Pir teng li mijaran dinêre; nikare mijaran baş şîrove bike.

### LI SER ALÎKARÎ HEVKARÎ Û PIŞTGIRIYÊ

**Agir bi serê min ketiye, tu jî rûnê xwe li ber diqijirînî:**
- Ez nikarim pirsgirêka xwe çareser bikim, tu jî hatî alîkariyê ji min dixwazî.
**Bi destê wî girt:**
- Parast; lê xwedî derket.
**Bi rojê ronahiyê ji min re pê neyêxe:**
- Di firehiyê de alîkariya min neke.
**Dest dayê:**
- Nehişt perîşan bibe; jê re bû alîkar; piştgiriya wî kir.
**Destê xwe dan hev:**
- Alîkarî dan hev; bi hev re xebitîn; bûn yek.
**Destê xwe da ber:**
- Nehişt perîşan bibe; jê re bû alîkar; piştgiriya wî kir.
**Destê xwe da pişta wî:**
- Bi heman wateyê.
**Destê xwe danî ser serê wî:**
- Parast; lê xwedî derket.
**Destê xwe dirêj kirê:**
- Bi heman wateyê.
**Destê wî girt:**
- Bi heman wateyê.
**Dewla serê te:**
- Bi xêra te karê me pêk hat.
**Dewlet li serê te be:**
- Bi heman wateyê.
**Ez ji te re, tu ji kê re?**
- Ez alîkariya te dikim, tu alîkariya kê dikî?
**Ez korê te me, eger te korek ji min baştir dît, jixwe baş e, eger te nedît ez li vir li benda te me:**
- Tu kengê bixwazî ez ji bo te amade me; ji aliyê min ve ti pirsgirêk dernakevin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



Bi kamîreya Hemza Sêvo

## 18'ê Gulanê; Zindîmayînek ji têkoşîna şehîdan re



Meha Gulanê di dîroka têkoşeran de ji Denîz Gezmiş, Hakî Karer û çalakiya fedayî ya zindana Amedê, bû meha şehîdên şoreşger û têkoşer. Di Tevgera Azadiya Kurdistanê de, ji bo xwedîderketina li van mîrasan 18'ê Gulana sala 1981'an weke meha Şehîdan hat îlankirin.**R-3**

## Rizîna mêjî... Dema ku ekran dibin barek li ser hiş

Di salên dawî de, cîhan di qadeke dîjîtal a vekirî de dijî ku qet dev ji hilberandina naveroka bilez, kurt û vala bernade. Bi belavbûna girseyî ya telefonên pêşketî û platformên medya civakî re, têgeheke nû derketiye holê ku hem nakok e û hem jî fikaran çêdike; Ew jî 'Rizîna Mêjî- Brain Rot' e.**R-7**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1377 | 17-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## Zindawerên çand û hunera Kurdî

Pêşeng û hunermend Hozan Mizgîn şehîd bû, lê wê mîraseke mezin a hunerî, çandî û têkoşerî li pey xwe hişt, ew bû çavkaniya îlhama nifşên nû yên hunermend û têkoşerên jin, wê bi cesaret û baweriya xwe ya kûr a azadiyê rê li ber bi hezaran jinan vekir ku di rêyên têkoşîna çandî, şoreşgerî û leşkerî de bimeşin.**R-9**

# PIŞTÎ 387 SALAN DERFETA YEKÎTIYA NETEWEYÎ Û DEMOKRATÎK

Kurdistan bi Peymana Qesra Şêrîn re kirin du perçe û bi Syeks Picot û Lozanê re kirin çar perçe. Piştî 387 salan derfeta Kurdan çêbûye vê perçebûnê ji hole rake û yekîtiya netewî û demkratîk ava bike.**R-6**






## 'Maf ne di axaftina bi zimanê dayikê de ye, lê di fermîkirina wê de ye'

Mamoste Ferîda Ibrahîm da zanîn ku zimanê Kurdî hebûn, naskirin û berdewamiya li ser çanda Kurdî ye û got, "Di Sûriye nû de misogerkirina mafê Kurdan ne tenê biaxaftina bi zimanê Kurdî ye, lê belê fermîkirina ziman di dibistan, hemû dezgeh û saziyan de ye."**R-2**

## 'Serkeftina pêvajoya aştiyê, rê li entegrasyona Rojava vedike'


Berpirsê Têkiliyên Giştî yên Navenda Firat ya Lêkolînan Welîd Çolî diyar kir ku entegrasyona li Rojavayê Kurdistanê bi pêvajoya li Bakurê Kurdistanê ve girêdayî ye û got, "Eger pêvajoya aştiyê pêş ve biçe, wê li Sûriyê jî entegrasyon pêş ve biçe."**R-5**




Jin û pêşengtiya entegrasyona demokratîk li Rojava
Bêrîtan Xalid R-2


Pêwendiya Exlaqî Ya Dualîteya Rojnamevan – Ziman
Idrîs Henan R-4


Nexşeya nû ya şikestoka Tirkiye-Îsraîl
E.Pêjder Altan R-6


Parastina bîra civakî
Remezan Olçen R-9

# ‘Maf ne di axaftina bi zimanê dayikê ye, lê di fermîkirina wê de ye’

Mamoste Ferîda Ibrahîm da zanîn ku zimanê Kurdî hebûn, naskirin û berdewamiya li ser çanda Kurdî ye û got, “Di Sûriye nû de misogerkirina mafê Kurdan ne tenê biaxaftina bi zimanê Kurdî ye, lê belê fermîkirina ziman di dibistan, hemû dezgeh û saziyan de ye.”

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Di derbarî girîngiya zimanê Kurdî û neqebûlkirina hikumeta demî ji hebûna zimanê Kurdî re Mamoste Ferîda Ibrahîm bersiva pirsên Rojnameya me da, hevpeyvîn wiha bû:

**-Girîngiya roja zimanê Kurdî ji bo we?**

Roja Zimanê Kurdî ne tenê rojeke pîrozbahiyê ye, di heman demê de soza parastina mîrateya Celadet Alî Bedirxan û Kovara Hawarê ye ku bingeha alfabeya me ya nûjen avêtin. Ev roj bangawaziyeke pîroz e ku em her tîp, her deng û her gotina Kurdî di dil û mejiyê xwe de zindî bihêlin, ji ber ku windabûna zimanekî, windabûna cîhanekê ye. Ev roj roja tekoşînê ye ji bo naskirina û berdewamkirina hebûna gelê Kurd. Tê dîtin ku dijmin hertim dixwaze zimanê Kurdî qir bike ev yek tê diyar kirin ku çiqasî zimanê Kurdî xwedî girîngiyekî ye. Roja zimanê Kurdî ji bo gelê Kurd nasnameye ku çawa li seranserî cîhanê herkes xwe bi zimanê xwe dibînin û li gor wê nasnameya xwe didin xuyanîkirin, ji bo me jî hebûn, naskirin û berdewamiya li ser çanda Kurdî ye. Her wiha zimanê Kurdî bîr û hizra me ye civakî ye ji ber gelê me bi hezarên sala bi vî zimanî axivî ne û mêjiyekî xwe yê xurt bi vî zimanî afirandine ji ber ku di hemû cûreyên jiyana xwe de ev ziman bikar anîne. Zimanê Kurdî ne tenê amûreke ku em bi riya wê dan û standinê dikin bi taybet gelê kurd ku di rewşekî re derbas dibin, dide xuyakirina ku berdewamiya bikaranîna ziman berdewamiya hebûna wa ye ku dijmin bi hemû awayan dixwaze ziman tune bike.

**-Erkek çawa dikeve li ser melê mamosteyan ji bo xwedîderketina li zimanê Kurdî?**

Heya ku ziman were parastin û domandin, erk dikeve ser milê her Kurdekî ku her Kurdek di çi warî de be bikaribe vî zimanî biparêze. Raste mamoste li dibistanan zarokan fêrî zimanê dayikê dike lê dema ew zarok biçe cihekî din di çi beşê jiyanê de bê ew cihê bi zimanekî din biaxive, ev yek nakokiyê dixe civakê de û ziman qelis dibe. Ji ber vê yekê ez dixwazim balê bikşînin li ser vê dema hestiyar de ku pêwîstiya me hemûyan bi ziman heya ji dayikeke di hundirê malê de heya serok û siyasetmedarekî, pêwîst e xwedî li vî zimanî derkevin heya ku em bikaribin bigihêjin mafê xwe yê rewa. Lê mamoste erka wa çiye di vê qonaxê de, tê dîtin ku xwendekar demeke dirêj li dibistanê dimîne, erkê mamoste ew e ku bi dilsozî û bi awayekî hezkirinê vî zimanî di dilê zarokan de bide çandin.

Ji ber ku gelek rêbazên pişaftinê li derdora me belav bûne, mînaka berbiçav ku enternêt bi awayekî zêde ketiye jiyana mirovan de, hemû gelên cîhanê bi riya vê enternêtê re tên pişaftin û bi taybet gelê ku tevî zimanê wan parçe bû ye û zînor ketiye di navbera wan de, lewma mamoste roleke wê ye herî mezin heye ku bikaribe ziman him di milê ruhî de di dilê xwendekaran de biçîne ku çawa ji zimanê xwe hezbikin, ziman ji bo wan çiye û armanca me axaftina bi zimanê Kurdî çiye pêwîst e vî hestî bi wan bide hîskirin. Her wiha bi rê û rêbazên nûjen vî zimanî bighîne zarokan bi taybet xwendekarên seretayî, heger zarok di salên xwe yê destpêkê de bi awayekî rast û durist fêrî zimanê xwe bibin, çiqas mezin jî bibin û fêrî zimanê din bibin jî wê zimanê xwe yê dayikê esas bigrin.

**-Zimanê Kurdî vejînek çawa çêkiriye di Rojavayê Kurdistanê de?**

Ev nêzî 15 sala ye ku Şoreşa Rojava dest pê kiriye, yek ji destkeftiyên herî girîng ku di vê şoreşê de hatî bidest xistin parastina zimanê Kurdî bû. Parastin bi çi awayî hat kirin; gelek ked, zehmetî û êş kişandin di vî alî de hat dîtin, dema ku şoreş dest pê kir ne mamoste hebûn ne jî biranş û xwendekar hebûn. Hemû xwendekarên me jî li ser sîstem û zimanê rêjîma Baas hatibûn perwerdekirin, lewma dema şoreşê dest pê kir yekser hizir û fikra ku ket bala me de ku pêwîst e em gelê xwe di vî warî de hişyar bikin. Gelo hişyarkirineke çawa? Bi rêya belavkirin û vegera li zimanê Kurdî ji ber ku heya her gelek hebûna xwe nas bike divê li zimanê xwe vegere. Lewma şoreşa me bi şoreşa ziman dest pê kir, bi vî rengî guherînek pir mezin di nava civakê de çêkir, nifşên nû yên



ku bi zimanê Kurdî perwerdeya xwe dîtin di warê Kurdewariyê de û hezkirina wan ji ziman re, dan û standina wan de pir cûda ne. Ev xalekî pir girînge ku zarok dema di dibistanan de bi zimanê xwe diaxivin ev yek azadiyekî dide wan, ne mîna ku kesê bi zimanê dijminan fêr bibe.

**-Hûn hewldanên paşguhkirina zimanê kurdî ji aliyê hikumeta Sûrye çawa dinirxînin?**

Piştî hilweşandina rêjîma Baas ê ku bi salan bûn li herêmê zimanê kurdî qedexe kiribûn, piştî 15 salan ji têkoşîn û şoreşê me hewilda ku em hebûna gelê kurd li vir biparêzin bi sedan xwendekar û mamoste hatin perwerde kirin û mamadekirin ji bo qonaxek nû ya Sûriyeke demokratîk, ji ber ku hêviyên me pir mezin bûn ku piştî hilweşîna rêjîma Baas em di welatekî azad û demokratîk de jiyan bikin, ku welatekî pirrengiyê û pirçandiyê qebûl bike. Lê mixabin tê dîtin bi hilweşîna rêjîma Baas re heman fikir heman îdolojîk û heman rêjîm careke din xwe dûbare dike. Hat dîtin ku destpêka hatina serokê sûriya yê demkî re biryarek derxist ku mafê gelê kurd wê were parastin, ev gaveke erênî bû ji ber ku em di welatekî de bûn ku gotinek bi kurdî qedexe bû dema ev biryar derket em kêfxweş bûn ku pêşketin di sûriyê de çêdibin û hêviyên me hebûn ku em vê gave pêş bixin.

Heya roja îro jî diyalog berdewamin ev mersûma ku derketî bi tena xwe nebese ji bo naskirina mafê kurdan li herêmê, ji ber ku naskirina mafê kurdan ne tenê biaxaftina bi zimanê kurdî ye, lê belê fermîkirina ziman di dibistan û hemû dezgeh û saziyan de ye. Hêvî û xebata me ji bo vê yekê berdewam dike, raste heya niha gavên erênî di vî milê de nehatine avêtin lê em di wê baweriyê de ne ku gelê me wê vê tekoşînê berdewam bikin heya ku mafê xwe misoger bikin.




**Ji Ramanên Jin**



**Bêrîtan Xalid**

## Jin û pêşengtiya entegrasyona demokratîk li Rojava

Di nav şert û mercên siyasî yên dijwar de, jinên Rojava rola xwe ya pêşeng di avakirina civakeke demokratîk de diparêzin.Ji destpêka şoreşê heta îro, jin ne tenê di qada leşkerî de, lê di siyasetê, rêvebirina sivîl, Perwerdehiyê û biryargirtinê de jî bûne hêzeke bingehîn.Projeya rêveberiya demokratîk li Rojava, bi beşdariya jinan hate avakirin. Sîstema hevserokatî, saziyên taybet ên jinan û beşdariya wan di hemû qadên jiyanê de, wek modela nû ya rêvebirinê tê dîtin.Lê gel hemû van destkeftiyan, pirsgirêk û xeter hîn jî li beramberî jinan hene.Di salên dawî de, jinên Rojava bûne yek ji hêzên herî girîng di avakirina civakeke demokratîk de. Rola wan tenê li qadeke taybet ne maye, belkî di siyasetê, rêvebirinê, perwerdehiyê, civaka sivîl û heta di parastina civakê de jî xuya bûye. Ev beşdariya berfireh bû sedem ku jin li Rojava wek pêşeng û sembola guhertina civakî were dîtin.Projeya rêveberiya demokratîk li Rojava ji destpêkê ve girîngiyeke mezin da beşdariya jinan. Sîstema hevserokatî û saziyên taybet ên jinan, gavên girîng bûn ji bo ku jin di biryargirtinê de cihê xwe bistîne. Ev model ne tenê di nav Rojava de balkêş bû, lê di asta navneteweyî de jî hate gotûbêjkirin wek mînakek ji demokrasiya ku bingeha wê li ser beşdariya jinê ava bûye.Lê gel hemû van destkeftiyan, jin hîn jî bi gelek astengiyan re rû bi rû ne. Guhertinên siyasî û şert û mercên herêmê carna metirsiyek li ser maf û azadiyên jinan çêdikin. Ji ber vê yekê, di vê demê de ku behsa entegrasyona demokratîk tê kirin, gelek pirs derdikevin holê li ser ka rola jinê dê çawa were parastin û gelo jin dê di pêvajoyên nû de hîn jî cihê xwe biparêze.Geşedana her civakekê bi awayekî rastîn girêdayî beşdariya hemû kesan e, û di vê çarçoveyê de jin roleke bingehîn digire. Ji ber ku jin li Rojava ne tenê temaşevan bûne, lê di gelek waran de bûne biryarder û rêvebir. Ev nîqaş niha li Rojava bûye yek ji mijarên herî girîng yên siyasî û civakî. Di nav van guhartinan de, jinên Rojava peyamek eşkere didin ku ew ê destkeftiyên xwe biparêzin, û di her pêvajoya siyasî de dê rola wan ya pêşeng bimîne.Ji ber ku, bi gotina gelek çalakvanan, civakeke demokratîk bê deng û biryara jinê nikare pêşve here.”Ew bi têkoşîna xwe karîbûn guhartinek civakî biafirînin û têgihiştinek nû li ser azadî û demokrasiya ava bikin. Niha jî, li gel hemû nîqaşên li ser entegrasyonê, jin dixwazin peyameke eşkere bidin: ku tu pêvajoyeke siyasî nikare bê beşdariya rastîn a jinan serkeftî be. Ji ber ku demokrasiya rastîn tenê bi hebûna deng, maf û biryara jinê dikare were avakirin. Ji ber vê yekê, parastina destkeftiyên jinê li Rojava ne tenê berpirsiyariya jinan e, lê berpirsiyariya hemû civakê ye. Çimkî civakek ku jin tê de azad be, dikare pêşerojeke demokratîk û aram ava bike. Li vir mirov dikare bêje Jin li Rojava tenê beşek ji civakê nîne, lê bingehê guhertin û avakirina jiyana demokratîk e. Her pêvajoyeke siyasî ku deng û rola jinê tê de tune be, nikare demokrasiya rastîn ava bike.



# Parzemîna Afrîqayê; Di navbera dewlemendî û xizaniyê de

Afrîqa yek ji kevintirîn parzemînên cîhanê ye û bi parzemîna reş tê naskirin. Ew piştî Asya duyemîn parzemîna herî mezin e ji aliyê nifûsê ve. Afrîqa xwedî gelek çavkaniyên xwezayî û hêza mirovî ye. Lê tevî wê jî gelek welatên wê hîn jî bi xizanî, kêmbûna pêşketinê û pirsgirêkên civakî re rûbirû ne.

**Navenda Nûçeyan**

Afrîqayê yek ji kevintirîn û cihêrengtirîn parzemînên cîhanê ji hêla xwezaya dewlemend, çand û çavkaniyan ve. Gelek caran wekî “Parzemîna reş” tê binavkirin, ew ji hêla nifûsa xwe ve piştî Asyayê parzemîna duyemîne. Tevî çavkaniyên wê yên xwezayî û mirovî yên berfireh, asta wê yên aborî, siyasî û civakî hîn dûrî derfetan e ku bikaribe bibe hêzeke cîhanî ya bi bandor.

### Cihê wê yê erdinîgarî

Parzemîna Afrîqayê di naveresta parzemînên Cîhana Kevin de ye. Li bakur bi Deryaya Spî, li rojava bi Okyanûsa Atlantîk, li bakur bi Kanala Siwêsê (ku wê bi Asyayê ve girêdide), li bakur-rojhilat bi Deryaya Sor û li başûr-rojhilat û rojhilat bi Okyanûsa Hindî ve tê sînorkirin.

Ew duyemîn parzemîna herî mezin a cîhanê ye, rûbera wê zêdetirê 30 milyon kîlometre çargoşeyî derbas dike. Xwedî 54 welatên taybetmendiyên hevparin, lê ew ji hêla rûber, nifûs û çavkaniyên aborî ve ji hev cuda ne.

Cezayîr mezintrîn welatên parzemînê ye bi rûbera 2 milyon û 381 hezar û 741 kîlometre çargoşeyî, piştre jî bi rûbera 1 milyon û 865 hezar û 813 kîlometre çargoşeyî Sûdan tê. Avhewaya parzemînê di navbera avhewayên  tropîkal û jêrqutbî dihewîne, herwiha ew di navbera herêmên hişkesalî li bakur û deştên Savanayê yên ku barana zêde li beşên navîn û başûr dibare, de ye. Di heman demê de deştên berfireh li deverên nêzîkî peravan hene. Cûdahiya di erdnîgariyê de di cûrbecûra şînatiyan, dewlemdiya sewalkarî û ajalên kovî de, diyar dibe.

### Dîroka parzemîna Afrîqayê

Gelek şîrovekirinên li ser navê parzemînê hene û ji hev cuda ne. Hin kes dibêjin ku eslê wê ji Fenîqî ye, ji Afar e, ku tê wateya tozê (Xubar). Yên din jî dibêjin ku eslê wê ji Amazîxî ye, ji Îfrî, Îfran û Afêr e, ku tê wateya şikeftê (Kehif). Şîrovekirinek sêyemîn destnîşan dike ku navê wê ji Îfrîqîs, yek ji padîşahên kevnar ên Yemenê yên “Tebabîa”, hatiye girtin.

Gelek lêkolînerên anthropology, parzemîna Afrîqayê wekî yek ji kevintirîn herêmên niştecihbûnê yên li ser erdê dibînin, di nîvê sedsala 20’an de, kolandin û delîlên hebûna mirovan li ser vê parzemînê ku dîroka wan vedigere deh hezaran salan hatin keşifkirin. Gelek şaristaniyên cûda li wir hatin avakirin, bi taybetî yên Romayê û Yewnanî.

Di dawiya sedsala 19’an ji aliyên Ewropayê ve hat dagirkrin û piraniya welatên wê “kolonîze kirin”. Piraniya dewlemendî û xezîneyên wê talan kirin, wêranî û hilwişandin hat kirin û gelek ji xelkê wê wek koleyan birin, da ku bên kirîn û firotin herwiha ew wekî kelûpelan di rêya Okyanûsa Atlantîk re birin “Cîhana Nû” li Amerîkayê.

Paşê Ewropiyan ew di nav xwe de parve kirin, Fransa, Spanya û Îtalyayê Bakurê Afrîkayê kontrol kirin, di heman demê de Brîtanyayê kontrola xwe li ser herêma başûrê Afrîqayê xurt kir.

Parzemîna Afrîaqayê piştî nîvê sedsala 20’an ji nû ve dest bi xilasbûna ji kolonyalîst kir, lê hin welatên wê ketin nav pevçûnên herêmî an etnîkî, ji kolonyalîzmê derbasî pergal û rêjîmên leşkerî bûn. Parzemînê di navbera destpêka salên 1960’î û dawiya salên 1980’ê de, zêdetirî 70 darbeyan dît herwiha 13 serokên wê hatin kuştin.

Piştî ku welatên parzemînê serxwebûna xwe ji kolonyalîzmê bi dest xistin, ji ber hilwişandinê ew neçar man ku bi rêya peymanên ku çarenûsa wan kontrol dikirin, xwe ji nû ve bi kolonyalîstên xwe ve girêbidin.

### Hejmara infuse

Li gorî daneyên Worldometer ên li ser bingeha texmînên Neteweyên Yekbûyî, nifûsa Afrîqayê di 12’ê Gulana 2026’an de gihaştiye nêzîkî 1.58 milyarî.

Pispor texmîn dikin ku nifûsa parzemînê dê heta sala 2050’î bigihêje 2 milyar û nîv. Niha nifûsa Afrîqayê ji sedî 19,9 nifûsa giştî ya cîhanê pêk tîne.

Tê payîn ku nifûsa cîhanê di sala 2050’î de bigihîje (9,664) milyarî, ev jî li gorî nifûsa cîhanê ya 8,231 milyarî a di sala 2025’an de, 1,432 milyar kes zêdetir e.

Li gorî belavbûna nifûsa cîhanê di sala 2050’î de li gorî parzemînan, tê payîn ku Afrîqa ji sedî 25,5 ji nifûsa cîhanê temsîl bike.

Niştecihên parzemînê ji etnîkeyên cuda ne, ku piraniya wan ji sedî 70’ê yên çerm reşin û Maxoliyê ku li koma giravên başûrê rojhilatê parzemînê kom bûye. Qefqasî li Bakurê Afrîqayê di nav Ereb û Amazîxiyan de û li Qiloçê Afrîqayê kom bûye herwiha Eqzam ku niştecihên resen ên başûrê Afrîkayê ne.

### Ziman

Hin lêkolîn nîşan didin ku niştecihên Afrîqayê zêdetirî du hezar zimanên xwecihî an herêmî diaxivin, ku hemû di bin şeş malbatên bingehîn ên ziman de ne, di nav wan de zimanên Afro-Asyayî (Hamito-Samî) hene, ku li Rojhilata Navîn, Bakurê Afrîkayê, Qiloçê Afrîkayê û hin deverên herêma Peravê belav in.

Zimanê Zincî li rojava, başûr û naveresta Afrîqayê tê axaftin, di heman demê de zimanê Sûdanî ji hêla afrîqiyê li herêma Nîla Jorîn ve tê axaftin. Zimanê Polonez ê Malayo ji hêla gelên Maxolî ve tê axaftin. Zimanê Tuyî San jî ji hêla Eqzaman ve tê axaftin. Wekî din hin zimanên ku bi rêya bazirganiyê pêş ketine, wekê zimanê Peravî li rojhilatê Afrîqayê û Hûsa li rojavayê Afrîqayê. Erebî li zêdetirî 12 welatên Afrîkî zimanekî fermî ye.

Gelê Afrîqayê bi piranî Xiristiyan e ji sedî 45, piştre Îslam ji sedî 40 û bi dehan olên Wsenî û eşîrî yên herêmî tên.

### Aborî

Parzemîna Afrîqayê xwedî beşek mezin ji hilberîna cîhanî ya hin madeyên xav ên mineral (Meden) û çandiniyê ye,  aboriya wê li ser çandinî, bazirganî, pîşesazî, geştiyariyê û çavkaniyên mirovî yên mezin e, lê ew ji ber nekarîna wê ya baş bikaranîna çavkaniyên xwe, bi piranî lawaz e. Di heman demê de beşek mezin ji nifûsa wê ji nifûsa her parzemînek din zêdetir ji xizaniyê dikişîne, gelek welatên wê neçar mane ku madeyên xav an kelûpelên sereke ji bo bidestxistina pereyê biyanî hinarde bikin.

Afrîka xezîneyeke rastîn a dewlemendiya cîhanê ye. Ji sedî 30 çavkaniyên madenî yên cîhanê lê heye, di nav de hîdrokarbon, meden û kevirên nirx buha, krom, boksît, kobalt, uranyûm, lîtyûm, manganez, komir û hêmanên erdê yên bêhempa. Ev hemû di nav rûbereke giştî ya bi qasî 30,37 milyon kîlometreçargoşeyî de ne (nêzîkî du qat ji Rûsyayê mezintir û di avhewayeke germtir de), ku bi saya cihê wê yê erdnîgarî, xwedî erdeke berhemdar e kare xwarina hemû gelê Afrîqiya peyda dike. Wekî din Afrîqayê kare bighêje rêyên veguhastinê yên cîhanî yên rasterast, nemaze yên okyanosyan.

Afrîqayê kakao, qurenful, dendikên xurmê, fasûliyên vanîlya û kasava, herwiha moz, qehwe, fîsteq, pembû, lastîk, şekir û çayê di heman demê de ajala û masiyan hinardedike.

Nîjer welatê herî mezin ji hêla hejmara şêniyan e di heman demê de hilbirînerê sereke yê petrola Afrîqî û aboriya herî mezin a parzemînê ye, bi rêjeyek herêmî ku di sala 2013’an gihaşt 510 milyar dolarî. Lêbelê, ev yek di asta jiyana piraniya gelê Nîjeryayê nîşan neda, hem jî ne di binesaziya welêt de xuya bûye.

### Geştiyarî

Tevî pirsgirêkên parzemînê, lê ew ji ber çavkaniyên xwezayî yên balkêş û xweş, di nav de park, daristan û çiya yek ji cihên geştiyariyê yên girîng do cîhanê de dimîne. Di nava deverên geştiyariyê yên herî navdar li parzemînê Perestgeha Maasai Mara li Kenyayê, Şelalên Victoria li



Zimbaboyê û Zambiyayê, Îhramatê Misrê û bajarê Djînî li Maliyê hene.

### Birçîbûn û nexweşî

Gelek welatên Afrîqayê ji ber birçîbûn, germbûna gerdûnî, pevçûnên ji bo desthilatdariyê û şerên navxweyî ji gelek êş kişandin. Somaliyê, Esiyobiyayê û welatên Peravê di salên 1780’an de birçîbûna herî dijwar jiyan kirin. Di sala 1738’an de, nîvê gelê Malî ku bi navê (Timbuktu) dihat nasîn, jiyana xwe ji dest dan. Herwiha Misir di navbera salên 1687 û 1731’an de şeş caran birçîbûn dît.

Sûdan jî, di destpêka sedsala 9’an de para xwe ya birçîbûn dît, ku ev yek ji sedemên hilweşandina rejîma Serokê wê Cafer Nîmeyrî li Xartûmê bû.

Herêma Perava a Afrîqayê di sala 2010’an de, bi taybetî li Nîjer û Afrîqaya Rojava, ji ber ziwabûn û kêmbûna xwarinê, yek ji xirabtirîn birçîbûnên li parzemînê re rû bi rû ma. Di Tîrmeha 2011’an de, li Qiloçê Afrîqayê bi hezaran kesan li Somaliyê û welatên cîran ji ber ziwabûneke giran jiyana xwe ji dest dan.

Di nav nexweşiyên herî xeterna ên ku bandorê li parzemînê dikin de nexweşiya Îdiz herwiha kolera (nexweşiyeke bakterî ya ku bandorê li pergala helandinê dike) di heman demê de Malarya û Ebola hene.

### Yekîtiya Afrîqayê

Yekîtiya Afrîqayê di 9’ê Tîrmeha 2002’an de, wekî alternatîfek ji bo Rêxistina Yekîtiya Afrîkayê, bi îlhama tecrûbeya Yekîtiya Ewropayê û bi armanca yekkirina nerînên siyasî û aborî yên welatên parzemînê û hêsankirina entegrasyonê di navbera wan de, hate damezrandin, lê gelek caran di çareserkirina pirsgirêk û krîzên siyasî û aborî yên di navbera welatên Yekîtiyê de têk çûye.

Meclisa Giştî ya Yekîtiyê, ku ji serokên dewletên endam an nûnerên hikûmetên wan pêk tê, ku desteya herî bilind a biryardanê ye herwiha perspektîf û helwestên wê diyar dike, piştî wê jî ji hêla girîngiyê Parlamentoya Afrîqayê tê.

### Afrîqa di sala 2026’an de

Peymangeha Almanî ya Lêkolînên Cîhanî û Herêmî (GIGA), ya girêdayî Peymangeha Leibniz a li Hamburgê ye, raporek li ser çawaniya ketina Afrîqa ji bo sala 2026’an weşand. Rapor ji hêla Tevin Tafese û Profesor Christian Soest, serokê ofîsa Policy Exchange û Berlînê li GIGA-yê ve hatiye amadekirin.

Rapora ji Peymangeha Almanî ya Lêkolînên Cîhanî û Herêmî GIGA nîşan dide ku parzemîna Afrîqayê di nav zêdebûna pirsgirêkên siyasî, ewlehî û aborî de dikeve sala 2026’an, di çarçoveya berdewamiya rejîmên demdirêj, zêdebûna xwepêşandanên gel, krîzên darayî û pevçûnên çekdarî.

Di raporê de hat destnîşan kirin ku çend serokên Afrîqayê hewl didin ku bi rêya hilbijartinên ku bi baldarî têne şopandin, di desthilatdariyê de bimînin, wekî ku li Uganda, Cîbûtî û Komara Demokratîk a Kongoyê tê dîtin. Di heman demê de, xetereyên darbeyan û aloziyên siyasî ji ber rêveberiya qels, rêjeyên bilind ên xizaniyê û newekheviyê zêde dibin.

Li eniya ewlehiyê, serhildanên çekdarî berdewam dikin ku ji herêma Peravê wêdetir berfireh bibin, ligel zêdebûna pevçûnên cudaxwaz û zextên avhewayê ku bêîstîqrariya li seranserê parzemînê zêde dikin.

Ji hêla aborî ve, welatên Afrîqayê bi krîzek deynan a aloz û zehmetiyên di refînansekirinê de, digel kêmbûna nirxên diravî û zêdebûna zextên darayî re rû bi rû ne. Çend welat jî hewl didin ku ji medenên stratejîk û hişê çêkirî AI sûdê bigrin, tevî binesaziya qels û pirsgirêkên teknolojîk Herwiha di raorê de behsa guhertinên jeopolîtîk ên li Afrîqayê kir û diyar kir ku kêmbûna bandora Fransayê û têkiliyên aloz bi Rojava re derî ji bo hevkariyên berfireh bi Çîn, Rûsya û welatên Kendavê re vedike, di demekê de ku welatên Afrîqî hewl didin di navbera hêzên navneteweyî yên cûrbecûr hevsengiyê bidest bixe.

Raporê tekez kir ku pêşeroja aramiya li Afrîqayê bi baştirkirina rêveberiya hilbijartinê, xurtkirina rêveberiyê, çareserkirina krîzên deynan û avakirina helwestek yekgirtî ya Afrîqî li ser pirsgirêkên teknolojiyê û reformên navneteweyî ve girêdayî ye.

# Dorpêçkirina bêdeng a li Rojava

**Botan Amed**

Di nexşeya parçekirî ya Rojhilata Navîn de, hin erdnîgarî ji erdê wêdetir in; ew bîranîn, berxwedan û îradeya gelan ji bo ji nû ve şekildana çarenûsa xwe temsîl dikin. Rojava wateyek wisa dihewîne. Ev ceribandina şoreşgerî, ku bi salan di nav şer, dorpêçkirin, ambargo û hesabên navneteweyî de têkoşîn kiriye, ne tenê ji bo gelê Kurd lê ji bo hemî gelên herêmê bûye sembola hêviya jiyanek nû. Ji ber ku modela civakî ya ku li Rojava derketiye holê têgihîştinek siyasî ya cûda temsîl dike ku azadiya jinan dide pêş, ji bo jiyana hevpar a gelan parêzvaniyê dike û armanc dike ku ji bo civakên ku ziman, çand û nasnameya wan hatiye înkarkirin, nefesek nû bide. Tam ji ber vê sedemê ye ku Rojava ne tenê bi êrîşên leşkerî, lê di heman demê de bi dorpêçkirinên dîplomatîk, projeyên entegrasyona siyasî û stratejiyên ku armanc dikin ku wê ji hundur ve têk bibin jî hedef tê girtin. Îro, nîqaşên entegrasyonê yên di navbera HTS û Rojava de wekî qonaxek nû di vê têkoşîna mezin a siyasî de şekil didin. Her çend ji derve wekî pêvajoyek ku bi têgehên wekî "îstîqrar", "ji nû ve avakirin" û "yekparçeyiya Sûriyeyê" hatiye xemilandin were pêşkêş kirin jî, di rastiyê de bingeha pevçûnek pir dijwartir datîne. Ji ber ku pirsgirêk ne tenê yekbûna îdarî an jî lihevhatina teknîkî ye. Pirsa rastîn ev e ku meriv çawa destkeftiyên demokratîk ên ku Rojava bi salan bi bedelên mezin bi dest xistiye hilweşîne. Bi taybetî dema ku avahiya îdeolojîk a xeta HTŞ-ê tê lêkolînkirin, bi zelalî tê dîtin ku ew bi pergala Rojava ya li ser bingeha rizgariya jinan, têgihîştina wê ya pirçandî ya jiyanê û modela wê ya demokratîk a li ser bingeha meclîsên gel hatî organîzekirin re di nakokiyeke kûr de ye. Di vê nuqteyê de, rola dewleta Tirk yek ji aliyên herî diyarker ên pêvajoyê pêk tîne. Ji ber ku ji bo Enqerê, Rojava ne tenê avahiyek e ku li ser sînor hatî çêkirin; ew di heman demê de mînakek dîrokî ya nîşan dide ku gelê Kurd dikare bi nasnameya xwe, zimanê xwe û îradeya xwe ya rêxistinkirî hebe. Ji ber vê yekê, yek ji armancên sereke yên polîtîkayên ku bi salan hatine şopandin ne tenê qelskirina Rojava ji hêla leşkerî ve ye, lê di heman demê de hilweşandina wê ji hêla civakî û siyasî ve jî ye. Gelek nêzîkatiyên ku îro di bin navê entegrasyonê de têne anîn jî vê armanca stratejîk li pişt xwe digirin. Li cihê ku dewleta Tirk bi şerê rasterast nikaribe encaman bi dest bixe, ew hewl dide ku Rojava bikişîne nav pergalê û bi zextên dîplomatîk, hevpeymaniyên herêmî û hêzên wekîl karakterê wê yê şoreşgerî xera bike. Nêzîkatiya HTS di vê nuqteyê de girîng e. Ji ber ku gotara entegrasyonê pir caran li şûna lihevkirinek demokratîk di navbera wekhevan de, lêgerîna navendî ya serdestiyê nîşan dide. Pirsgirêkên wekî hilweşandina mekanîzmayên xweparastinê, bindestkirina rêveberiyên herêmî ji bo avahiya navendî, qelskirina serokatiya jinan û paşxistina garantiya destûrî ya nasnameya Kurd nîşan didin ku ev pêvajo ne tenê mijarek teknîkî ye. Armanca bingehîn a van polîtîkayan bêbandorkirina giyanê civakî ye ku Rojava dike ew çi ye û qelskirina dînamîkên berxwedana rêxistinkirî ya gel. Lêbelê, tiştê ku Rojava heta roja îro domandiye ne tenê hêza leşkerî ye. Faktora diyarker a rastîn îradeya gel e ku nirxên xwe biparêze. Îradeya ku di nav xirbeyên li Kobanê de li ber xwe da, heman hişmendî ye ku îro di bîra mirovan de li Hesekê, Qamîşlo, Şehba û Dêrikê dijî. Ji ber ku li van axan, mirovan ne tenê avahiyek siyasî ava kirin; wan nasnameya xwe li hember înkarê jî ji nû ve ava kirin. Veguhestina ji demekê ku axaftina bi Kurdî qedexe bû heta xala îro ku zarok bi zimanê dayikê perwerdehiyê dibînin ne tenê guhertinek siyasî ye, lê di heman demê de veguherînek dîrokî û civakî ye . Ji ber vê yekê, têkoşîna ku îro tê meşandin ne tenê têkoşînek leşkerî an dîplomatîk e; ew di heman demê de têkoşînek ji bo parastina bîranînê ye. Ger civakek dîrok, çand, ziman û nirxên xwe yên hevpar neparêze, her destwerdana derveyî di dawiyê de dikare bibe sedema hilweşîna civakî. Ji ber vê yekê, yek ji refleksên herî girîng ku gelê Kurd divê îro nîşan bide ev e ku destkeftiyên Rojava ne tenê wekî modelek rêveberiyê, lê wekî keda kolektîf û berhevkirina dîrokî ya gel bibîne. Xwedîtiya civakî di vê nuqteyê de girîngiyek jiyanî bi dest dixe. Ji ber ku şoreş ne tenê li qada şer, lê di heman demê de di wijdanê civakê de jî têne parastin. Dema ku rêxistina jinan, dînamîzma ciwanan, zindîtiya meclîsên gel û çanda hevpar a hevgirtinê di nav civakê de qels dibe, destwerdanên derveyî hêsantir dibînin ku encam bigirin. Ji ber vê yekê, êrîşên li ser Rojava îro ne tenê li ser sînor pêk tên; ew nirxên exlaqî yên civakê, rihê yekîtîyê û bîranîna berxwedanê jî hedef digirin. Bi taybetî ji bo gelê Kurd, mijara yekîtiya neteweyî êdî bûye pêwîstiyeke dîrokî. Di her serdemê de ku avahiyên siyasî yên parçebûyî û nakokiyên navxweyî kûrtir dibin, hêzên herêmî karîne bi hêsanî destkeftiyên gelê Kurd hedef bigirin. Ya ku îro hewce ye hişmendiyeke civakî ya hevpar e ku ji hesabên siyasî yên teng derbas dibe. Ji ber ku nirxên ku li Rojava têne parastin ne tenê bi herêmekê ve sînordar in; ew temsîla lêgerîna gelê Kurd a ji bo azadiyê ya sed salî ne. Di dilê nîqaşên ku îro di bin navê entegrasyonê de têne kirin de, di rastiyê de pirsek yekane heye: Gelo Rojava dikare karakterê xwe yê demokratîk biparêze? Hemû alozî li dora vê pirsê dizivire. Ji ber ku hêzên navendî naxwazin xwerêxistinkirina gel qebûl bikin; ew hewl didin ku Rojava veguherînin avahiyek îdarî ya asayî. Lê rastiya bingehîn a ku tê jibîrkirin ev e: Rojava ne tenê projeyek siyasî ye. Rojava çandeke berxwedanê ye ku di bîranîna gelên ku bedel dane de mezin bûye. Ji ber vê yekê, her hewldanek ji bo jiholêrakirina wê ne tenê li dijî hikûmetekê ye, lê di heman demê de li dijî hêviya jiyaneke hevpar a gelan e. Ji ber vê yekê ye ku xwedîderketina civakî ya ku gelê Kurd îro nîşan dide ne tenê niha, lê di heman demê de pêşerojê jî diyar dike. Ji ber ku tiştê ku çarenûsa neteweyan diyar dike pir caran ne tenê hêza dewletan e, lê belê civak çiqas îradeya xwe nîşan didin. Pêşeroja Rojava, heta radeyekê, di vê yekê de ye: gelo gel çiqas nirxên xwe diparêzin, çiqas rêxistinkirî dimînin û çiqas hişmendiyeke hevpar a berxwedanê pêş dixin.

# Mijar ji nivîsa tabeleyê wêdetir e...

**Argêş Gewda**

Bi hatina desthilatdariya rejîma Baas ku 8'ê Adara 1963'an de hat ser desthilatdariyê gelek êş û zext hatin jiyankirin. Bi derxistine kembera Erebî mal û milkên gelên ku ji dervê Ereban dest danîn li ser û di heman demê de jî mafên wan yên mirovî hemû dest wan hatin girtin. Bi hişmendîya nijadperestî ya ku bi "Yek al, yek ziman, yek netew" hevîyên civakên ku sed salan bi hevre jîyan dikirin hatin şikandin. Nenaskirina Kurdan û bênasname hiştina gele ku rêjeya %/15 ji welatiyên herêmê pêktên, bo sedema hejandina textê wan yên desthiladarîyê. Di wê mijarê de, di sala 2011'an û şûnda, bi serhildanên gel û nerazîbûnên pêkhate û gelên ku derve hatibûn hiştin li Rojhilata Navîn bi taybet jî, li Sûriyê serdemek nû hat destpêkirin. Li gorî wan pêşveçûnan jî, nûve dizayna herêmê pêşket. Bi paradigmaya Netewên Demokratîk ya bi peşengtiya Rêber Abdullah Ocalan ve gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê pergala xwe ya jiyanî da avakirin. Bi komînan bigire, heya dibistanan bi xebatên jiyanî jî hemû aliyên jîyanî yekpar û bi rengê pêkhateyên herêmê dihatin jiyankirin.

Di taybet sala 2024 û 2025'an de sal û serdemekê nû ji bo Rojhilata Navîn taybet bi Sûriyê hat jiyankirin. Piştî têkçûyina Rejîma Baas ne tenê desthiladarî hat gûhertin di heman demê de jî hişmendîya nijadperest ya Ereb bi rêbazekê nû xwe dubare kir. Hatina HTŞ'ê û serokê hikûmeta Demkî ya Şamê Ehmed El Şeraa li ser deshiladariya nû ji bo gelê Sûriyê qeyran û kerasetekê mezin dan destpêkirin. Ji ber ku çawa Rejîma Baas bi destê Rûsya û Îranê dihat rêvebirin, di heman demê de jî, ew rêbaz bi destê dewleta Tirk ji destwerdana Sûriyê û Şamê hat dîtin. Ji ber kesên ku Ehmed Şeraa yanî binavê din Ebû Mihemmed Colanî anîn li ser desthiladariyê erk û peywîra wî berê da jî da bûn xuyakirin. Ji qelena hîn kiryaran giran e. Ji ber çeteyên girêdayi HTŞ'ê pêşerojên xwe zêde ne zelal û paqij bûn. Bi qetlîama ku li ser gelê Elewî û Dûrzî anîn di heman demê de jî êrîşên li ser bajarên ku kurd tê de jiyan dikirin Şehba, Heleb, Minbic hwd. Di dawîyê de jî bi gurkirina Tirkan we êrîşkirina li ser bajarên Rojavayê Kurdistanê armanca wan bingehîn diyar bû. Ji ber ku dijminahiya ziman û mafê gelê Kurd di dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girêspî de pêşiya xwe vekirin û di encamda jî kampa koçberên Efrînê li Şehba di dawiyê de jî, li Helebê jî dagirkerî pêkanîn. Di armanca wan êrîşan hemûyan jî ew bû ku jiyana ku hevpar hatibû avakirin ya ku bibû modela Rojhilat Navîn astengkirina wê bû. Di wê pêngavê jî her ku dihat payin rewşa gelên ku Sûriyê de baştir bib e, lê berovajî wê xerabtir bû. Bi hatina HTŞ'ê we xezanî, zext, qirkirin li zêdetir bû. Li gorî wan pêşveçûnan dihat hevî kirin ku piştî peymana 10'ê Adarê ya 2025'an û 8'ê Çileya 2026'an de li gorî rihe Entegrasyona Demokratîk bi rêbazekê demokratîk Kurd tevlî zagona Sûriyê ya nû bibin. Li gorî wê jî hem QSD'ê hem jî nûnerên Rêveberiya Xweser gelek ked û hewildan kirin. Ji bona ew jiyana hevpar bê parastin û hem jî aramiya ku li di navbera civakên Sûriyê de bê parastin. Lê hem ji destwerdana Tirkiyê ji aliyekê jî, hişmendiya HTŞ'ê ya tundrew nema hişt ku ew yek pêk bê. Her ku diçe ew metirsî berdewam dik e. Hema bêje hemû rayedarên hikûmeta Şamê rojane tên Rojavayê Kurdistanê di nav nijadperestiya Erebî ya hişmendiya olî dixwazin gelê Rojavayê Kurdistanê tevlî hikûmeta Şamê bib e.

Ew yek ne gengaze, pêk were ku heya mafên Kurdan yên weke zimanê dayikî û deskeftiyên jiyanî neyên parastin. Di xwezaya hebûne de, mijara herî girîng ziman e û mirov li ser koka xwe şîn dib e. Tikes nikare Kurd bike Ereb, Ereb bik e Tirk. Her civak û pêkhate li ser taybetmendî û piroziyên xwe hen e. Lê mixabin taybet jî ji bona Kurdan ew yek weke heram an jî qedexe tê dîtin. Ew Sed salin ku Kurdan ji bona zimanê xwe bi azad biaxivin û bê naskirin ew qas ked û bedel dan e. Di demên dawiyê li Rojavayê Kurdistanê bajarê Hesekê, li Dadgeha Mezin ya bajêr li ser tabloya hatibû daliqandin de, dû ziman hat dîtin. Raste, lê ne Kurdî, erebî û Ingilizî. Gelo li Rojavayê Kurdistanê Ingilîz hene? An jî bajarên Kurdan li Ewropa ne. Ne hejmara Sûriyê rêjeya herî bilind weke me jor jî anî li ser ziman Kurd lê dijîn. Lê nivîsa Kurdî qedexe ye, ya bi zimanê Ingilîzî tê nivîsandin. Ji ber nivîsa tabloyekê wêdetir e. Naxwazin Kurd bibin xwediyê deskeftiyan naxwazin Kurd di dengê wan jî derkeve. Dibêjin bila "Bila Kurd dîya xwe nebîne." Lê Kurd jî dibêjin em xwediyê wê axê ne, em ê zimanê xwe yê dayikî bi azad biaxivin. Entegrasyona ku bi rihê Banga Aşitî û Civaka Demokratîk hat pêşxistin tenê bi rêya ku Kurd Sûriyekê nûda cihê xwe bigirin re pêkan e.



# 18'ê Gulanê; Zindîmayînek ji têkoşîna şehîdan re

**Meha Gulanê di dîroka têkoşeran de ji Denîz Gezmiş, Hakî Karer û çalakiya fedayî ya zindana Amedê, bû meha şehîdên şoreşger û têkoşer. Di Tevgera Azadiya Kurdistanê de, ji bo xwedîderketina li van mîrasan 18'ê Gulana sala 1981'an weke meha Şehîdan hat îlankirin.**

**Esma Miśtefa**

Tevegera Azadiya Kurdistan a ku doza rizgariya gelê Kurd û mirovahiyê esas girt, di vê oxirê de bi xwîna şehîdên qehreman her mezin bû û çax veda. Mîrasa têkoşîna wan Şehîdan îro zêdetirî 50'î sal ji têkoşîneke hemdem a bê rawestandin ji bo azadiya mirovahiyê û Kurdistanê, dom kir û xwe parast. Mîmarê vê tevgerê jî rêber Abdullah Ocalan e, ku PKK'ê bi komek hevalên xwe yên destpêkê re ava kir, îro navê vê Tevgera li çaraliyên cîhanê bi serkêşiya Rêbertiyê, deng vedide. Helbet ev têkoşîn bi hêsanî û ji xwe ber negihîşt vê rojê. Îroj nav û doza Kurdistan di nava dewlet û hêzên ku ew mêtînger kirine de, tê behskirin. Ger îro destkeftiyên vî gelî hene û doza gelê Kurdistanê li sehneyên navneteweyî têne nîqaşkirin, ew bi saya têkoşîna Tevgera Azadiyê û Şehîdên ku navê xwe li rûpelên dîrok xistiye ye. Ji bo bîranîna fedekartî, lehengî û sekna bi rumet a wan Şehîdan, divê her tim di bîrwariya dîroka Kurdsitanê de zindî bimînin û neyên windakirin, ji ber wê jî em dibêjin 'Jibîrkirin Îxanet e' jibîrkirina van heqîqet û rastiyan jibîrkirina mîras û rastiya roja me ya îro ye. Ji ber ku Tevgera Apoyî bi tevgera şehîdan tê naskirin di yekemîn Konferansa xwe ya PKK'ê di sala 1981'an de, meha Gulanê bi taybet 18'ê meha Gulanê weke meha Şehîdan ragihand. Sedema îlankirina vê dîrokê jî ji ber ku kadroyên pêşeng yên Tevgera Azadiya Kurd Şehîd Hakî Karer û Halîl Çavgûn di vê rojê de Şehîd ketin. Şehîd Hakî Kerar di dîroka PKK'ê de yekemîn Şehîdê ku bi guleya dijmin Şehîd ketiye ye. ji ber wê jî ev roj ji bo bîranîna van mîrasan hate veqetandin.

Di heman demê de ji ber ku rêber û pêşengên Şoreşa Ciwanên Tirkiyê Deniz Gezmiş, Huseyin Inan, Yusuf Aslan û Ibrahim Kaypakkaya di meha Gulanê de Şehîd ketin, ev meh meha Şehîdan hate ragihandin. Ev ciwan weke ciwanên şoreşger li hember desthilata Tirkiyê di salên 1960'yan de derketin û di 6'ê Gulana 1972'an de ji aliyê hikumeta Tirkiyê ve hatin darvekirin.

Hakî Karer Yekemîm Şehîdê Tevgera Azadiyê ye ku bi aslê xwe Tirk e, lê ji hevalên destpêkê û yên herî nêz ên Rêber Apo bû. Haqî Karer di sala 1950'î de li Ulubey a Ordu yê hate dinê. Dibistana Seretayî, Navîn û Lîseyê li Orduyê xwend. Di Fakûlteya Enqerê ya Fen ê de dest bi Zanîngehê kir. Haqî Karer ji Tevgera Şoreşger a Ciwanan ku pişti sala 1970'î pêş ket bi bandor bû û di demeke kin de fikre Şoreşgerî pejirand. Di heman pêvajoyê de Kemal Pîr û Serok Apo nas kir. Di sala 1973'an de li ADYOD'ê di asta organîzekirinê de bû berpirsyar. Di civîna Dikmen a sala 1976'an de bi qebûlkirina biryara vegerê ya welat pêşî çû Batman û ji wir jî derbasî Dîlokê bû. Li Dîlokê pratîkek serkeftî meşand. Bi xistina dewrê ya rêxistina Kontra "Sterka Sor" ku di bin kontrola MÎT ê de hatibû avakirin Hakî Karer li Dîlokê ji bo ku bi Kontra Alaattin Kapan re nîqaş bike hate dawet kirin. Hevdîtin di 18'ê Gulanê li Dîlokê di qehwexaneyekê de pêk hat. Di encama amadekariyên kemîneke qirêj di 18'ê Gulanê sala 1977'an de Hakî Karer Şehit Ket. Ev bûyer wekî xaleke zivirînê di dîroka PKK'ê de tê dîtin û rê li ber partîbûnê vekiriye.

Rêber Abdullah Ocalan derbarê Şehîd Hakî Karer de dibêje: "Ji dema ku şoreşa Kurdistanê fêm kir, bêyî dudilî dest ji xwendina zanîngehê berda, ji derdora xwe re bû îlham, hemû zehmetiyan derbas dikir."

**Çalakiya fedaî ya 4 şoreşger û pêşengan**

Piştî îlankirina PKK'ê, 12 Îlona 1980`yî artêşa Tirk derbeyek pêk anî, gelek komkujî kirin, îşkence kirin û bi sed hezaran kes girtin. Di nava kesên hatine girtin de, gelek pêşengên PKK'ê yên wekî Mehmet Hayrî Durmuş, Mazlûm Dogan, Kemal Pîr, Ferhat Kurtay, Necmî Oner, Mahmut Zengîn û Eşref Anyik jî hebûn.

Roja 18`ê Gulana 1982`yan Ferhat Kurtay, Necmî Oner, Mahmut Zengîn û Eşref Anyik li Zîndana Amedê li hemberî zilm û polîtîkayên xiyanetê ferz dikin, bedena xwe da ber agir û şehîd bûn. Ji ber wê yekê jî meha Gulanê meha Şehîdan e.



Fermandarê Biryargeha Giştî ya HPG'ê Mûrad Karayilan di axaftineke xwe li ser bîranîna 18'ê Gulanê de wiha dibêje: "Seranserî meha Gulanê de hema her rojê wê de şehîdên me hene. Bi esasî tevahî mehan de şehîdên me hene. Gelek mehan de şehîdên wisa pir girîng hene. Meha Gulanê di Kurdistanê de wekî destpêka sezona salayê; erê, ne destpêka biharê ye lê ji ber ku di Gulanê de berf dihêle û tevger çêdibe lewma jî di meha Gulanê de şerên pir mezin çêbûne, berxwedanê pir mezin çêbûne. Ji bo wî jî bi rastî meheke pir bi wate ye, tê de berxwedaniyên pir girîng çêbûne. Gulan meheke wisa ye. Pêngava 15'ê Tebaxê ji bo bîranîna şehîdan bê jiyan kirin, tola wan li erdê nemîne bi hêrsek mezin di pêşengiya rêheval Mahsum Korkmaz (Egîd) de hat tevger kirin û wisa hate rêxistinkirin. Di tevahî dîroka me de şehîdan roleke hêzbûnê, xurtbûnê lîstine. Şehîd bûne bingehî xurtbûnê, hêrsbûnê û hîn zêde tevlîbûnê."

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû beşdarî bernameya taybet a li Medya Haber TV di 12'ê Gulanê de bûbû di destpêka axaftina xwe de derbarê Şehîdên pêşeng yên heyva Gulanê de wiha dibêje: "Meha Gulanê ji bo me gelekî girîng e. Pêşengên me yên gelekî hêja di nava vê mehê de şehîd bûn. Ji xwe şehîdê me yê destpêkê yê mezin hevrê Hakî Karer e. Bêguman Denîz Gezmîş, Yûsûf Aslan, Huseyîn Înan, Îbrahîm Kaypakkaya jî di nava meha Gulanê de şehîd bûn. Ji pêşengên tevgera me Mehmet Karasûngûr û Îbrahîm Bîlgîn jî şehîd bûn. Di vê mehê de li zindana Evîn a Îranê Şîrîn Elemhûlî, Ferzad Kemanger, Ferhad Wekîlî û Elî Heyderyan hatin darvekirin. Her wiha di vê mehê de Celal Başlangiç, Sirri Sureyya Onder, Kasim Engîn, di dema nêz de li Elmanyayê Bernd Ruprecht, her wiha Şukru Çatalbaş şehîd bûn. Leyla Qasim û çar hevalên wê jî di vê mehê de şehîd bûn. Çaran, wan hevalên me xwe şewitandin. Di meha Gualnê de gelek şehîdên me hene. Azad Sîser di vê mehê de şehîd bû."

# Li girtîgehên hikumeta demkî; Ji destpêka salê ve 10 kes hatine kuştin

**Navenda Nûçeyan**

**Zindan û navendên girtinê yên hikumeta demkî ya Sûriyê şahidiya zêdebûnek metirsîdar di hejmara mirinên di bin îşkenceyê de dikin, ji destpêka salê û heta niha 10 welatiyên Sûrî ji ber işkenceyê di zindanên Sûriyê de jiyana xwe ji dest dane.**




Li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê, ji destpêka sala 2026'an ve li girtîgehên Heleb, Humis, Dêrazorê, Reqa û Siweydayê ji ber işkenceyê 10 kesan jiyana xwe ji dest dane.

Sedemên girtinê ji beşdarbûna di xwepêşandanên aştiyane û tohmetên endametiya di saziyên leşkerî an siyasî de cûda bûn. Di heman demê de, çavkaniyên herêmî û mafên mirovan piştrast kirin ku hejmarek qurbanî di dema girtina xwe de rastî îşkenceya fîzîkî û paşguhkirina tenduristiya giran hatine, berî ku cenazeyên wan radestî malbatên wan werin kirin an jî mirina wan di zindanan de were ragihandin.

**Hûrguliyên bûyerên mirina ji ber işkenceyê di zindanê hikumeta demkî de:**

Di 8'ê Çileyê de, piştî nêzîkî du hefteyan ji girtina wî ya keyfî, ciwanekî ji gundewarê rojavayê Humisê ku Elewî bû, di yek ji navendên ragirtinê yên hêzên Hikûmeta Demkî ya Sûriyê de ji ber îşkenceya laşî û paşguhkirina tenduristiyê mir.

Di 30'ê Çileyê de, çar niştecihên taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê di bin îşkenceyê de di navendên ragirtinê yên Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de hatin kuştin. Ew di bûyerên ku di 26'ê Çile de li her du taxan qewimîn de hatinbûn girtin.

Di 3'ê Nîsanê de, mirina ciwanekî ji bajarokê Hatla li gundewarê rojhilatê Dêra Zorê, ku ji "mezheba Şîe" bû, bû sedema nîqaşeke berfireh, piştî ku rayedarên girêdayî hikûmeta demikî, yên ku berê ew girtibûn, mirina wî di nav yek ji navendên girtinê de ragihandin.

Di 7'ê Nîsanê de, ciwanekî ji "mezheba Elewî" piştî salekê ji girtina wî li zindana "El-Belûna" li Humsê, piştî serdegirtinekê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve ku komek malbatên ji heman mezhebê li herêma "Hoş El-Esas" li başûrê El-Sa'an El-Eswed li gundewarê Humsê hedef girt, hat kuştin.

Di 21'ê Nîsanê de, xortekî ji bajarokê Hermûşiyê li gundewarê rojavayê Dêra Zorê, çend roj piştî girtina xwe, di yek ji zindanên Ewlekariya Giştî de li bajarê Dêra Zorê mir.

Di 1'ê Gulanê de, welatiyekî Kurd ê çil salî, kêmtir ji 48 demjimêran piştî girtina wî ji aliyê dewriyeke hêzên ewlekariya giştî ve li bajarê Reqayê, di bin îşkenceyê de hat kuştin.

# Zimanê Kurdî ji Hawar heta Rojava

**Cemîl Xoce**

Ziman ne tenê amûreke ragihandinê ye; ew bîr, nasname û hebûn e. Dema ku zimanê gelekî tê hedefgirtin, êrîş ne tenê li ser peyvan bi xwe ye, lê li ser dîrok, çand û hişmendiya wan a kolektîf jî ye. Ji ber vê yekê Zimanê Kurdî bi dehsalan parçeyekî bingehîn a doza Kurd maye, ji ber ku ew her gav keleha dawîn bû ku nasnameya wan ji jêbirin û înkarkirinê diparêze.

Di nav vê rêwîtiyê de, Celadet Bedirxan wekî yek ji kesayetên herî girîng derket holê ku jiyana xwe ji bo xizmeta Zimanê Kurdî terxan kiriye. Di sala 1893'yan de li Stenbolê di nav malbata Bedirxaniyan de ku bi çand û siyasetê navdar bû, ji dayik bû û di nav mîrate, stran û çîrokên gelêrî yên Kurdî de mezin bû. Tevî salên sirgûn û xerîbiyê jî, wî qet dev ji doza xwe berneda, ziman veguherand têkoşîneke çandî ya demdirêj, ji ber ku wî fêm dikir ku gelekî ku zimanê xwe winda bike, beşeke girîng ji nasnameya xwe winda dike.

Di 15'ê Gulana 1932'yan de, wî li Şamê Kovara "Hawar"ê damezrand. Ew gav gaveke dîrokî bû di jiyana Zimanê Kurdî de. Ew ne tenê kovareke asayî bû, lê projeyeke çandî ya berfireh bû. Armanca wê vejandin, rêxistinkirin û bipêşxistina Zimanê Kurdî bû. Cara yekem bû ku Kurdî bi berfirehî û bi awayekî sîstematîk bi alfabeya Latînî hate nivîsandin. Ev yek xaleke werçerxê ya mezin di dîroka çanda kurdî ya nûjen de nîşan da. Hawar heta sala 1943'yan berdewam kir. Pêncî û heft hejmar weşand, 23 ji wan bi tîpên erebî bûn, lê hejmarên mayî bi tîpên latînî hatin weşandin. Kovar mehê du caran dihat weşandin û li ser wêje, ziman, siyaset û lêkolînên çandî disekinî. Her wiha helbest, çîrok û lêkolînên kurdî jî diweşandin. Hejmareke mezin ji rewşenbîr û nivîskarên Kurd beşdarî wê bûn. Tevî şert û mercên sirgûnî û sansurê, kovar bi rêyên dijwar û carinan veşartî gihaşt Kurdistanê, ji ber ku hin bazirgan û rêwiyan çapên wê bi dizî difirotin da ku bigihînin ber destê xwîner û kesên ku bi ziman û çandê re eleqedar dibin. Bi vî awayî, "Hawar" bû dibistaneke rastîn a Zimanê Kurdî, ku beşdarî bipêşxistina Rêzimana Kurmancî û standardîzekirina nivîsandina kurdî ya nûjen bû.

Zimanê Kurdî bi xwe yek ji zimanên herî kevn û dewlemend ên herêmê ye. Ew zimanekî kevnar ê Mezopotamyayê ye ku xwedî repertuareke zimannasî ya pir fireh e. Ew ji 735,000 zêdetir peyvên bingehîn dihewîne. Di heman demê de ferhenga wê, tevî zaravayên wê yên cûrbecûr, digihêje nêzîkî 1.2 mîlyon peyvan, ku ew ji hêla ferheng û biwêjan ve dike yek ji zimanên herî dewlemend ên cîhanê.

Tevî dewlemendiya xwe, Zimanê Kurdî bi dehan salan rastî hewildanên çewisandin û marjînalîzekirinê hatiye. Zimanên din li ser civaka kurdî hatine ferzkirin û herêmên kurdî rastî polîtîkayên înkar û bişaftinê hatine. Armanca wan jî qelskirina nasnameya wan a çandî û zimanî bû, çi bi qedexekirina perwerdehiya bi kurdî be, çi jî bi ferzkirina zimanên din di jiyana rojane, medya û saziyên fermî de be.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re, Zimanê Kurdî derbasî qonaxeke nû bû. Piştî qedexeya dehsalan, cara yekem, kurdî bi awayekî eşkere û berfireh li dibistan, sazî û navendên çandî û medyayê derket holê. Ji zimanekî marjînalîzekirî veguherî zimanekî perwerde, çand û rêveberiyê. Piştî salên dirêj ji bêparbûnê, zarokan dest bi fêrbûna bi zimanê xwe yê dayikê kirin. Di vê serdemê de her wiha peymangeh, zanîngeh û navendên hînkirina kurdî hatin vekirin û bi dehan çalakiyên çandî û medyayê derketin holê ku beşdarî vejandina ziman di nav civakê de bûn.

Ev veguherîn ne tenê gaveke çandî bû, lê belê meseleyeke parastina nasname û hebûnê bû. Tu gel nikare pêşeroja xwe ava bike ku ji zimanê xwe yê dayîkê bêpar be. Ji ber vê yekê, Zimanê Kurdî ji bo civaka Kurd bûye yek ji destkeftiyên herî girîng û hesas ên Şoreşa Rojava.

Îro, bi hewldanên dûrxistin û bêparkirinê yên ku ji aliyê Hikûmeta veguhêz a Şamê ve li dijî Zimanê Kurdî têne kirin, ev doz ji nû ve derketiye holê. Hewldana ji nû ve bêparkirina ziman, an jî înkarkirina mafê fêrbûna bi zimanê dayîkê ji Kurdan re, ne mijareke îdarî ye, lê belê mijareke hebûn û nasnameya bi mîlyonan kesan dest dide. Ji ber vê yekê, Zimanê Kurdî ne mijareke bazar an tawîzê ye, ji ber ku ew rasterast bi rûmeta gel û mafê wan ê xwezayî yê parastina çand û nasnameya xwe ve girêdayî ye. Herwiha, parastina Zimanê Kurdî nikare bi şert û mercên siyasî yên demkî ve girêdayî bimîne; divê ew wekî mafekî destûrî yê zelal û garantîkirî were destnîşankirin. Her destûreke ku Zimanê Kurdî nas neke û mafê perwerde, çand û rêveberiyê tê de garantî neke, ji bo Kurdan netemam dimîne. Ziman ne îmtiyazeke ku were dayîn, lê mafekî xwezayî û nayê înkarkirin e. Zimanê ku li hember qedexe, înkar û bêparkirinê li ber xwe daye, heta ku gelekî ku xwe bi wî zimanî ve girê bide û wê wekî beşeke ji azadî, nasname û hebûna xwe bibîne hebe, ew ê paşve gav neavêje.

FENER



Idrîs Henan

## Pêwendiya Exlaqî Ya Dualîteya Rojnamevan – Ziman

Bi çêbûna mirovahiyê re, zimanê dayîkê û ragihandin wek dualîteyên ji hev nayên veqetandin ji bo parastina bîra giştî ya civakê û avakirina nasnameya çandî bi hev re hatine. Ziman ne tenê amûrekî hevgihîştinê ye, lê belê hawûza dîrok, nirx û nihêrîna gerdûnê ye. Ragihandin jî ew qada ku ziman tê de bikar tê û bi rêya wê jî tabloya giştî ya civakê tê pênasekirin. Ji ber vê sedemê, hêzên mezin ên mêtingerî û kolonyalîzmê di dirêjahiya dîrokê de têgihiştine ku dagirkerî tenê bi axê temam nabe, lê bi kontrolkirina ziman û ragihandinê re serguha dibe. Bûyera ku di 14'ê vê mehê de li Navenda Çand û Huner a Efrînê rû da, bi zelalî tekezî li ser wê hişmendiya dagirkeriyê ya kontrolkirina dualîteya zimanê dayîkê - ragihandin dike. Dagirkeriya Tirk li Efrînê ji sala 2018'an û vir ve zimanê xwe li hemû qadan ferz kiriye û bi taybetî dualîteya ziman – ragihandin bi navendên xwe yên sereke ve girêdayî kiriye. Bi gotineke din, zimanê xwe serwer kiriye û zimanê Kurdî, ku li Efrînê zimanê dayîkê ye, paşguh kiriye. Ji bo vê yekê jî çapemeniyeke dûrî nirxên exlaqî û siyasî yên civakê ava kiriye. Lewra em dibêjin ku armanca wê gavê ne tenê pratîka li ser erdê ye, lê belê aliyekî exlaqî jî heye. Ji ber vê jî dewleta Tirk a dagirker bi zanebûn zimanê dayîkê li herêmên dagirkirî lawaz dike da ku hişmendiya dîrokî û lêgerîna çandî ya civakê têk biçe. Bi vî awayî jî şertên oto-asîmîlasyona di nav çanda serdest de diafirîne û ferdên ku ji kokên xwe qut bûne derdixe holê. Ji ber vê yekê, girîngiya rojnamegerî, wêje û hunera neteweyî ya bi zimanê dayîkê, ne kêmtirî amûrên berxwedanê yên siyasî ne. Têkiliya exlaqî ya ziman – ragihandin ew e ku mirov bi ziman û çanda xwe ya zikmakî xwe îfade bike. Ziman hestên naskirin û rûmetê dide mirovan. Ragihandin li ser navê van hestan diaxive, naskirin û rûmetê jî diparêze. Dema ku gelek di bin nîrê mêtingeriyê de ji zimanê xwe yê dayîkê bêpar dibe, çanda xwe ya resen ji ya serdestan kêmtir hîs dike. Ev jî cureyekî şîdeta sembolîk e ku rê li ber operasyonên pişaftin û qirkirina çandî vedike. Ji ber vê jî, parastina zimanê dayîkê bi rêya ragihandinê ne fanatîzma zimanî ye, lê belê misyoneke neteweyî ya parastina cihêrengî û mafekî rewa yê gelan ya xweîfadekirinê ye.

Ragihandina ku bi zimanê dayîkê êş, azar, hêviyên hevbeş, daxwaz, çîrok, raborî û îroyîna civakê temsîl bike, dikare hafîzeya giştî ya civakê ji bo nifşên pêşerojê biparêze û rê li ber parçekirina çandî ya civakê bigire. Ji ber vê jî, ew ne tenê alaveke veguhastina nûçeyan e, lê belê hewceyekî vejandin û parastina nasnameya neteweyî ye. Bi gotineke din, têkiliya ziman – ragihandin ji bo miletekî ku di bin pençên qirkirinê de ye, têkiliyekî exlaqî û hebûnî ye. Dema ku zimanê dayîkê di ragihandinê de zindî bimîne, şiyana berxwedana gel li hemberî siyasetên pişaftinê bihêztir dibe, bîra wî tê parastin û pêşeroja xwe bi vînekî azad tayîn dike. Rojnamegerî ne tenê bikaranîna ziman wek amûrekî veguhestinê ye, lê di heman demê de avakirina hişmendî, nasname û nirxên civakê ye. Lewra pêwendiya exlaqî ya di navbera rojnamevanekî û zimanê wî yê zikmakî de kûr e û bi berpirsiyariya wî/ê ya pîşeyî û çandî re têkildar e.

# Entegrasyon, gefên Wezîrê Dadê û hişmendiya BAAS'ê

**Roger Rojiyan**

Peymana Entegrasyona 29'ê Çileya 2026'an de di navbera QSD û Hukumeta demkî ya li Şamê hat îmze kirin ji bo tekoşîna gelê Kurd ne bi dawî, destpêkek nû bû. Ev Peyman her çiqas ji aliyê netewperestên paşverû ve wek teslîmbûnê tê binavkirin û antî propagandayeke bi vê avayê tê kirin jî ev polîtiqayên qirêj di nava gele Rojava de nayên pejirandin. Di qada dîplomasiyê de jî pêvajoya entegrasyonê veduguhure pêvajoya tekoşîneke dijwar. Ji bo rast fêmkirin û helwesteke rast raberkirinê divê mirov tim û tim tecrubeyên dîrokê sûd werbigre. Di nava çar parçeyên Kurdistanê de asimilasyona herî hişk, piştî Bakurê Kurdistanê li Rojavayê Kurdistanê pêk hat. Piştî Serhildana Şêx Seîd li Tirkiyê di bin navê Plana İslahata Şerqê de helandin, mişextkirin û qedandina gelê Kurd hat armanc kirin.

Li Bakurê Kurdistanê de amûrê herî girîng yên vê planê di bin du sernavan de hat pêkanîn; Takrîr – î Sukun û Tevhîdî tedrisat. Ango mişext kirin û asîmîlasyon. Van pêkanînên dewleta Tirk ji aliyê dewletên metînger ên din ve jî mînak hatin girtin û pratîze kirin. Taybet dewleta Surî ya ji aliyê hêzên hegemon ve hatiye çêkirin, van polîtîqayên faşîzma Tirk xwest teqlît bike. Piştî hatina li ser deshilatdariyê ya BAAS'ê (1963) li dijî Kurdan polîtiqayên helandinê şênbertir bûn. Di vê çarçovê de di bin navê kembera ereban de (Al – Hîzam Al Arabî) politikaya qedandina Kurdan li Suriyê kirin meryetê.

Li gorî vê, li ser 300 km'yê sînor di navbera gund û bajarên Kurdan de pêkhateyên Ereb hatin bi cîh kirin. Eraziyên Kurdan bi deste zorê li wan hat girtin û di nava Ereban de hatin belav kirin. Jimartina nifusê ya 1962'an de 120 hezar Kurd ji hemwelatiyê hatin derxistin. Zimanê Kurdî hat qedexe kirin û navê gund û bajarên kurdan hatin guhertin.

Hişmendî û polîtîkayên BAAS'ê li Surî ji bo qedandina Kurdan li ser teqlîtkirina polîtîqayên Tirkiyê hat avakirin. Ji ber ku ev polîtîqa wek polîtîqaya fermî ya dewleta Suriyê hatîbû damezirandin vê bi xwe re hişmendiyek jî ava kir. Ev hişmendiya ku li ser netewperestiya ereb hatiye avakirin îro jî bandora xwe di nava siyaseta Suriyê de nişan dide. Ji ber vê, di dema rejîma BAAS'ê de jî û rêvebiriya niha ya HTŞ'ê jî li ser heman hişmendiyê dimeşin.

Her çiqas li gorî xalên hevpeymana 29'ê Çileya 2026'an, ji bo heremên Kurdî biryarên li gorî çand û ziman xwerêvebirinê hatibe dayîn jî pêkanînên hukumeta veguhêz yên niha didin xuyakirin ku hişmendiya netewperestiyê hê jî serwer e.

Herî dawî tabelaya dadgeha Hesekê ya ku bi zimanê Kurdî – Erebî hatîbû nivîsandin li ser talîmata Wezareta Edaletê hate rakirin li cihê wê tabelaya bi zimanê Erebî û Îngîlîzî hate daliqandin. Li ser vê gel û ciwanên Hesekê rabûn li ser piyan û ew tabela avêtin zibaleya dîrokê.

Wezîrê Dadê Mazhar el-Weys ji eslê xwe li Dêra Zorê ye. Wek tê zanîn derdor û gundewarên Dêra Zorê di navbera 2017 û 2025 an de di bin qontrola QSD'ê de bû. Malbata Mazhar el Weys heremên rizgar kirî yên di bin qontrola QSD'ê de çend caran xwestin tevlîheviyan derxin û çeteyan re bi awayekî hevkar kar dikirin. Ji ber vê malbata wê ya teng de gelek kes hatın girtin û heman malbatê de hîn kes jî êrîşên li dijî QSD'ê de hatin kuştin. Ji ber vê Mazhar el Weys li dijî Kurd û Kurdîbûnê wek dijminekî sondxwarî tev digere.

Ji ber helwesta vê kesî niha entegrasyona dadê di rewşa xitimandinê de ye. Cihê ku heremên Kurdî, di nava saziyên dadê de zimanê Kurdî were qebûl kirin, ji aliye wezareta dadê ve gefên barkirina avahiyên dadê ji bo birina Dêra Zorê tê kirin. Diyare ku Wezîrê Dadê Mazhar el-Weys naxwaze sûd ji tecrubeyên dîrokê werbigre. Gelê Kurd dehan sale ji bo parastina ziman û çanda xwe tekoşîneke bê hempa dide. Ger pêwîst bike dê ji bo ziman û çanda xwe dîsa berê xwe bide Dêra Zorê… Dîroka nêz de mînaka vê hê jî zindî ye.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî



**Can Yûsiv**

Hunermenda şoreşger û pêşenga efsanewî

Hozan Mizgîn; xwedana dengê xweş, nûnera hunera şoreşgerî, pêşenga azadiya jinê ".

Di rûpelên dîroka Kurda de jinên Kurd ne tenê şahidên karesat û tekoşînan bûn, hertim di rêzên herî pêş de cih di girtin, ala û xewn jî hildigirtin û bi hêstir û berxwedana xwe destanên lehengî û fedakariyê diafirandin.

Ji demên kevnar heta roja me, jinên nemir derketine holê ku şopên xwe yên nayên jêbirin di hiş û wijdana neteweyî ya Kurdî de hiştine; wekî Rendê Xan, Meryem Xan, Eyşe Şan û Hozan Mizgîn, yên ku bûne sembolên tekoşînê, azadiyê û hunera resen.

Ev jin bi zext, çewisandin, polîtîkayên înkar û pişaFtinê re rû bi rû man, lê teslîm nebûn. Berevajî wê, êş kirin stran, azar kirin berxwedan û hesret kirin welatek ku di dil û awazan de vedijî. Di nav wan dengên nemir de, navê hunermenda şoreşger a şehîd Hozan Mizgîn derdikeve pêş, ku bû sembola hunera şoreşgerî ya Kurdî û dengekî ku heta niha jî li çiyayên Kurdistanê û bîranîna gelê wê de deng vedide.

Hozan Mizgîn ji stranbêjekê an jî hunermendekê zêdetir bû; ew ruhêke şoreşger a têkûz bû û dengekî ji bo Kurdatiyê û evîna kûr a azadî û welat diqêriya, dengê wê germahiya çiyayan û sekna şervanan di xwe de dihewand û stranên wê coş û hêvî di dilê gelê Kurdistanê yê çar parçeyan de diafirandin û herwiha cesaret û îradeya li dijî dijwariyan û dijminan nîşan didan.

Di 11'ê Gulanê de, salvegera şehadeta hunermend û pêşenga Kurd Hozan Mizgîn tê bîranîn, ew jina ku ji cîhana hunerê ber bi asta efsaneya tekoşînê ve bilind bû, û piştî koça xwe ya dawî weke semboleke zindewar a jina azad û hunera pabenîdar ma.

Hunermenda Kurd Xurbet Aydin, ya ku bi navê "Hozan Mizgîn" tê naskirin, di sala 1962'an de li gundê Bilayderê yê girêdayî bajarê Batmanê li Bakurê Kurdistanê, ji dayîk û bavek Kurd hat dinyayê, ji salên xwe yên ciwaniyê yên destpêkê ve, wê mezinahiya trajediya ku gelê wê tê de dijiya fam kir, zû peşdariya pêvajoya têkoşîna neteweyî bû.

Di sala 1980'an de bi rêya şehîd Mezlûm Doxan tevlî tevgera Azadiya Kurdistanê dibe û piştî wê li herêma Batmanê tevlî çalakiyên rêxistinî û siyasî dibe û dibe yekemîn jina Kurd ji wê herêmê ku tevlî nava refên tevgera şoreşgerî dibe.

Piştre bi komek hevalên xwe re çû Akademiya Mehsûm Qorqemaz li Lubnanê û li wir perwerdeya bîrdozî û leşkerî dît û bi pêşengên tevgerê re hevdîtin kir û li wir kesayetiya wê ya şoreşgerî û hunerî bi awayekî kûrtir û pêşketîtir ava bû.

Di sala 1983'an de, bi hevrêtiya şehîd Sefqan re hate şandin bo Ewropayê bi armanca rêxitinkirina çalakiyên çandî û hunerî di nav revendên Kurd ên li derveyî welat de.

Li wir, ew di damezrandina hin saziyên girîng ên hunerî û çandî de beşdarî kir, ji wan yên herî girîng Akademiya Hunerê "HUNERKOM" bû ,herwiha, wê di damezrandina "Koma Berxwedan" de jî rolek girîng lîst, ya ku paşê bû yek ji dibistanên sereke yên hunera şoreşgerî ya Kurdî.

Wê bi dengê xwe yê şîrîn û xurt, pîrozbahiyên Newrozê û helkeftên netewî û niştimanî pîroz dikir, wê ji bo welat, ji bo dayika Kurd, ji bo şehîdan, ji bo şoreşgeran û ji bo çiyayên ku hertim sembola azadî û berxwedanê bûne stran digotin.

Ji stranên wê yên şoreşgerî yên herî diyar û nemir ev in:

1- Lo hevalno
2- Hoy Çemê Hêzil
3- Gundîno Hawar
4- Heval Egîd
5- Dayê
6- Şoreşker
7- Newroz Cejnek Hêjayê
8- Welatê Min
9- Şêrê Kurdan
10- Partîzan



11- Delalê
12- Mekê Gazin
13- Batmane Batmane.

Her wiha wê gelek stranên şoreşgerî yên hevpar (duetên stranbêjiyê) bi hunermendên mezin ên Koma Berxwedan re pêşkêşkir , wek (Şehîd Sefqan, Xelîl Xemgîn û Seydxan), lewra ev berhem bûne parçeyekî bingehîn ji bîranîna hunera kurdî ya şoreşgerî re.

Di sala 1989'an de li bajarê Dêrikê yê Rojava li gel şehîd Ceger min ew nas kir û berê wê li deverên şer ên germ ên li çiyayên Kurdistanê bû. Wê demê bi aramiya xwe ya mezin û rihê rêhevaltiya xwe ya mînak dihat naskirin û di nîşaneyên wê de baweriyek kûr bi azadî û têkoşînê diyar bû.

Di sala 1990'an de, Hozan Mizgîn berê xwe da çiyayên Kurdistanê, û gihişte rêhevalên rêya xwe yên şoreşger, wê çeka şehîd Bêrîvan hilgirt û soza ku dabû wê bi cî anî, li wir, ew bû rêvebera herêma Gêrzanê, û di rêxistinkirina çalakiyên gelêrî û pêşxistina hunera şoreşger de rolek girîng lîst, berî ku paşê berê xwe bide herêma Tetwanê li Bakurê Kurdistanê.

Wêneya Mizgînê ku di destekî de çek û di destê din de tembûr digire, wêneya zindî ya wateya hunera berxwedanê bû, ji bo wê, huner ne tenê şehyanek an straneke derbasbûyî bû, lê beşek ji şerê hebûnê, nasnameyê û azadiyê bû.

Di 11'ê Gulana 1992'an de Hozan Mizgîn di şer û pevçûnên di navbera artêşa Tirk û gerîlayan de gihişt asta şehadetê, bi laşê xwe ji me dûr ket, lê dengê wê ,hê jî zindî maye di bîra milyonan ji gelê Kurd de.

Hozan Mizgîn karîbû muzîka Kurdî û xeta jina azad di heman demê de bi hev ve girê bide, herwiha karîbû hevrêzîyek çêbike di navbera huner û tekoşînê, û di navbera sadebûna mirovahî û ruhê şoreşê de.

Wê ji bo Kurdistanê û xwezaya wê ya bedew, ji bo jin û azadiyê û ji bo têkoşerên ku bi xwîna xwe destanên lehengî û fedekariyê afirandine, stran gotine.

Tevî ku pitir ji sî û çar salan di ser şehadeta wê re derbas bûye, lê dîsan jî deng û awazên wê yên şoreşgerî di wijdanê Kurdî de zindî mane û herwiha stranên wê jî di helkeftên netewî û şoreşgerî de, wek beşek ji nasnameya çanda Kurdî ya hevdem tên gotin.

Pêşeng û hunermend Hozan Mizgîn şehîd bû, lê wê mîraseke mezin a hunerî, çandî û tekoşerî li pey xwe hişt, ew bû çavkaniya îlhama nifşên nû yên hunermend û têkoşerên jin, wê bi cesaret û baweriya xwe ya kûr a azadiyê rê li ber bi hezaran jinan vekir ku di rêyên têkoşîna çandî, şoreşgerî û leşkerî de bimeşin.

Têkoşera Kurd Mizgîn ji nav me bar kir, lê dengê wê hê jî di hiş û bîra me de zindî maye, ew bi laşê xwe ji me dûr ket, lê mîrateyek dewlemend ji stranên xwe yên şoreşgerî û neteweyî yên bedew ku wê bi Kurdî û Tirkî distirand, ji me re hişt.

Bi huner û lehengiya xwe, ew bû çavkaniya îlhamê ji bo her kesê ku dilê xwe daye azadiyê ,wê zanî çawa bikeve dilê milyonan mirovan, bi wê hevrêziya bêhempa afirandî di navbera bedewiyê û exlaq de, û di navbera hunerê û ruhê şoreşgerî de .

Hozan Mizgîn dê bimîne yek ji damezrînerên rastîn ên hunera şoreşgerî ya resen a kurdî û dengekî nemir ku çîroka gelên ku dest ji xeyala xwe ya azadî û rûmetê bernedan vedibêje.

Ji giyanê wê yê pak re rûmet û mandarî, ji têkoşînê û mîrasa wê ya şoreşgerî, hunerî û çandî re mayînde û domdarî.



Remezan Olçen

## Parastina bîra civakî

Ji bo gelekî ku axa wî hatiye dabeşkirin û zimanê wî bi dehan salan di bin sîbera qedexeyan de maye, çîrok, stran, lorîk û metelok ne tenê amûrên hunerî ne; ew kelehên dawî yên parastina nasnameyê ne. Di sedsala dawî de ku polîtîkayên înkar, asîmîlasyon û tunekirinê li ser gelê Kurd hatine meşandin, berhevkariya zargotinê wekî çalakiyeke pîroz a berxwedanê ye. Divê em wisa bibînin û giringiyê bidinê. Ez çend hefte ne lis er zargotinê dinivîsim. Ji ber ku zargotin, bîra kolektîf a civakê ye. Kurdan ji ber ku fersenda perwerde û sazkirina arşîvên fermî yên bi zimanê xwe nedîtine, dîrok û çanda xwe di serî de bi rêya dengbêj, çîrokbêj û pîrejenan parastiye. Dema ku pirtûkên Kurdî hatin şewitandin û tîpên Kurdî hatin qedexekirin, bîra zargotinî mîna pirtûkxaneyeke zindî ya di bin erdê de kar kir. Îcar di wextekî welê de ku hîn jî serdest dixwazin bi fen û fûtan siyaseta xw eya asîmîlasyonê bimeşînin, xwedîderkerina li ziman û zargotin, xwedîderketina li xwe û hebûna xwe ye.

Ji evînên mîna Mem û Zîn û Siyabend û Xecê bigire heta destanên qehremaniyê yên mîna Dimdim û Dewrêşê Evdî, her berhemek zargotinî di heman demê de belgeyeke sîyasî û dîrokî ye. Ev berhem rûyê rastî yê sedsalên borî, êş, şahî û felsefeya jiyanê ya Kurdan vediguhezînin nifşên nû. Ji ber vê yekê, berhevkariya zargotinê ne tenê karê tomarkirina çend stranan e; ew parastina koka darê ye ku nahêle ba û bagerên asîmîlasyonê wê rakin.

Polîtîkayên înkarê yên dewletên serdest tenê bi qedexekirina ziman bi sînor neman; wan xwest ku şopên çanda Kurdî jî bikin malê xwe û wan asîmîle bikin. Gelek stran, çîrok û metelokên Kurdî hatin wergerandin û mîna ku milkê çandên din bin hatin nîşandan. Di vê xalê de, giringiya berhevkariyê dertê holê. Berhevkarî, xwedîpêsketina li keda sedsalan e.

Em ji sedsal û demên bihurî zêdetir rûbirûyê metirsiyeke nû ne. Ev jî modernîzma pergala serdest û windabûn-jidestdana nifşê kevn e. Kal û pîrên me yên ku ev xezîne di sîngê xwe de parastine, yek bi yek koça dawî dikin. Li gel wan, ferhenga zindî ya zimanê Kurdî jî diçe bin axê. Heke îro ciwan û lêkolînerên Kurd neçin gund bi gund, mal bi mal û wan çîrok, peyv, navên gihayan, urf û adetên ku nehatine nivîsandin tomar nekin, polîtîkayên înkarê yên sedsalî dê bi rêya vê valahiya modernîzmê bigihêjin armanca xwe. Zargotin materyalê herî dewlemend ê hunera nûjen e. Sînemaya Kurdî, şanoya Kurdî û wêjeya nûjen a Kurdî, çi qasî xwe ji rûbara zargotinê av bidin, ew qasî dibin xwedî nasnameyeke xweser û gerdûnî. Zimanê ku di nava lîstikên zarokan, metelokên pîrejenan û kilamên dengbêjan de dijî, di heman demê de zimanê herî pak û resen e ku ferhenga me dewlemend dike.

Îcar li vir karekî dikeve ser milê her xemxwirê zimanê Kurdî. Ew jî karê berhevkariyê ye. Erê lazim e bi rêk û pêk be. Bi tasnîfkirin û danaberhev be. Lê divê em ji bîr nekin ku berhevkariya zargotinê ne tenê karê çend akademîsyen an saziyan e. Ew erka her rewşenbîr, ciwan û welatparêzekî Kurd e. Divê her telefon bibe amûreke tomarkirinê û her mal bibe navendeke arşîvê.

Zimanê ku bi dehan salan di bin zexta înkarê de bi ser piyan ma, îro bi rêya berhevkariyê dikare bibe bingeha jiyana nûjen. Ji bîr nekin, parastina zargotinê, parastina xeta herî pêş a berxwedana çandî ye. Heta ku çîrokên me li ser zimanê zarokan bin, dê hebûna me jî her hebe.

# Berhemên Şîr: Dewlemendiya çanda Kurdî

Şîr, ji destpêka dîroka mirovahiyê ve wekî çavkaniya jiyanê û bingeha xwarinê hatiye pênasekirin. Ev şileya pîroz, ne tenê bi xwe, lê bi dehan berhemên ku jê têne hilberandin, di çanda xwarinê ya gelan û bi taybetî di jiyana civaka Kurdistanê de xwedî cihekî girîng e. Ji mast û penêr bigire heta rûnê nivîşk, sîrik û şijikê; Her berhemek ku ji şîr çêdibe, encama kedeke mezin, zanisteke xwezayî û parastina kevneşopiyeke hezarê salan e.

**Berçem Silêman/ Dêrik**

Berhemên şîr di parastina bedena mirov de xwedî roleke bingehîn e, şîr û berhemên wê ne tenê xwarin in, lê dermanekî xwezayî ne di milê: Pêşketina Hestiyan: Ji ber ku mîqdarek zêde Kalsiyûm û Fosfor di nav de heye, ji bo xurtkirina hestiyan û diranan bi taybetî ji bo zarokan mîna kaniyeke jiyanê ye. Sîstema Parastinê: Berhemên meyandinê wekî mast û dew tijî protînin. Ev bakteriyên sûdbexş rûvîyan paqij dikin û sîstema parastina laş li dijî nexweşiyan xurt dikin.

Vîtamînên Dewlemend: Şîr çavkaniya vîtamînên A, D, B12 û protînên bi kalîte ye ku ji bo mejî û masûlkeyên mirov pir pêwîst e.

### Awayê çêkirina van berheman

Mast yek ji berhemên herî belav e ku bi rêya meyandinê bakteriyên sûdbexş çêdibe. Destpêkê şîr tê kelandin da ku mîkrob bimirin. Paşê tê hênikkirin heta ku germahiya wê bibe nêzî 40-45 pileyan paşê mirov hinek haveyîn tevlî wî şîrî dike û derdora wê mirov ji 4 heya 6 seatan di niximîne û bi vî awayî amade dibe. Di heman demê de piştî ku mast amade dibe cûreyekî din ji mast jê tê çêkirin ku jê re mastî kîs dibêjin, ev mastê ku hatî amadekirin li kîs tê kirin heya ku zuha dibe paşê hin zeyt lê tê kirin û tê xwarin.

Penêr bi veqetandina pişka hişk ji ava şîr çêdibe. Şîr tê germkirin û havênê penêr (şitil an maye) lê tê zêdekirin. Şîr dêm digire û dibe wekî jîlayê. Ev girêk tên birîn û di parzûnê de tên zextkirin da ku ava wê biçe. Di dawiyê de tê xwêkirin û demekê di ava xwê de tê hiştin.

Rûnê nivîşk bi rêya lêdan an jidandina mast an jî xameya şîr çêdibe. Her yek ji wan jî bi şêwayekî cûda ye, dema ji Mast be; Mast di meşkê an makîneyên nûjen de tê jidandin. Bi vê lêdanê rûn ji dew vediqete û li ser avê dicive. Lê dema ji Xameyê be: Xameya ser şîr bi lezeke zêde tê lêdan heta ku rûn û av ji hev veqetin û bi vî rengî rûn çêdibe.

Dew berhemeke alî ye ku di dema çêkirina rûnê nivîşk de dimîne. Dema mast di meşkê de tê jidandin, rûn jê tê girtin; şileya ku li piştdimîne dibe dew. Dew vexwarineke pir saxlem e û ji bo hînikbûnê tê bikaranîn.

Lork ji ava ku piştî çêkirina penêr dimîne (ava penêr) tê çêkirin. Destpêkê ava penêr careke din tê kelandin. Dema kelî, pişkên protînê yên mayî li ser avê dicivin. Ev pişk bi parzûnê tên berhevkirin û dibe lork.

Qeymax rûnê herî sivik ê şîr e ku bi xwezayî li ser şîr dicive. Dema şîrê nû bi kêm-germî ji bo demeke dirêj tê kelandin. Paşê li cihekî hênik tê hiştin. Rûnê şîr li ser rûyê wê dibe qatek û ew qat tê girtin ji wê re qeymax tê gotin.

Sîrik û şingilîş du berhemên sereke ne ku ji bo zivistanê tên amadekirin û her du jî bingehê xwe ji dew an mastê tûr digirin.



### Çêkirina sîrikê

Sîrik bi taybetî li herêma Serhedê û Behdînanê pir navdar e. Taybetmendiya wê ya herî mezin bêhna sîr û giyayên çiyê ye. Destpêkê Penêrê nû yê parzûnkirî (penêrê lork an penêrê taze) tê hûrhûrkirin. Giyayên çiyayî wekî sîr, mendo, heliz an jî pûjan hûr dibin û bi penêr re têne têkelkirin, paşê xwêyeke baş lê tê kirin da ku xera nebe. Ev têkel di hundirê kûz an bîdonan de bi zext tê dagirtin da ku hewa tê de nemîne. Kûz serobinî tên veşartin da ku ava wê ya mayî biçe. Hin kes hen edema çêdikin jî yekser dixwin na hilînin ji ber ku sîrika nû û sîrika veşartî çêja wê cûdaye. Hin hene ku tenê benîr û sîran tenê dikin sîrik, hin hene Lorik ûmastê kîs jî tevlî dikin da ku sîrika wan şilek be hinekî.

Şingilîş di eslê xwe de mastê ziwa ye ku ji bo zivistanê tê bikaranîn û gelek şêwazên çêkirina wê hene, her herêmek yan jî her jinek li gor zanebûna xwe wê çêdike. Destpêkê Dew tê kelandin heta ku pişkên wê yên hişk li ser hev dicivin dibe mîna lorkê. Ev dewê kelandî tê xistin tûran û giranî tê danîn ser da ku ava wê bi temamî biçe. Piştî ku baş hişk bû, xwê lê tê kirin û mîna hevîr tê şehtandin. Parçeyên piçûk jê tên girtin û bi destan têne giloverkirin an jî şiklê hêkan didinê. Van gokan li ber tavê li ser qumaşekî paqij tên danîn heta ku mîna kevir hişk dibin û paşê di nav zeytê de dimînin û tê xwarin.

Her sal dibe bihar ji ber ku êm zêde dibe sewal jî şîrê wan zêde dibe êdî dayîk dest bi çêkirina van berheman dike him ji bo niha bixin him jî ji bo zivistanê dihilînin, gelek kes hene çêdikin û difroşon bi taybet herêma koçeran ji ber ku di milekî de debara jiyana wan li ser û di milekî din de bi şîr, benîr û sîrika xwe tên nas kirin. Kesên ku sewalê wan nebe şîr yan mast tînin û bi destê xwe li malê çêdikin. Ev yek nîşan dide ku gelê kurd bi çanda xwe ve girêdayîne û berhemên ku dê û bavên wan ew fêr kirîn berdewam dikin.

# Kargeha Roj a kelûpelên paqijiyê

**Navenda Nûçeyan**

**Kargeh di jiyana bajêr de xwedî roleke girîng a pêşxistina aborî û peydakirina derfetên kar e. Yek ji kargehên bajarê Dêrikê ku ji sala 2020’an ve hatiye vekirin, kargeha Roj a kelûpelên paqijiyê ye.**

Kargeh “dilê” zindî yê aboriya bajêr in û ji bo ciwanan derfetên kar diafirîne. Li şûna hawirdekirinê, pêdiviyên bajêr di nav kargehan de têne hilberandin û ev yek aboriya navxweyî xurt dike.

### Kargeha Roj a kelûpelên paqijiyê



Kargeha Roj ji sala 2020‘an ve li bajarê Dêrikê dest bi xebatê kir, ev kargeh ji bo kelûpelên paqijiyê ye. Di vê kargehê de lodalîn, şampo, faz, kilor, sabûna destan û hwd tê çêkirin. Ji destpêka avabûna wê heya sala 2025’an kar bi awayekî baş bi rêve diçû bê astengî, lê piştî ku rewş li Rojavayê Kurdistanê tevlîhev bû karê kargehê jî hat astengkirin di hemû aliyan de. Ji ber ku kelûpelên ku kargeh pê kar dike ji Sermeda û Reqa dihatin lê niha hatina wan zehmete û ev yek dibe sedema ku kar bisekine. Herwiha hijmara karmendên kargehê dighêjin 16 karmendî lê îro roj ji ber ku kar ber bi rawestandinê ve diçe û kelûpel ber bi xilas bûnê ve diçin, ne her roj kargeh kar dike û kar kême, lewma hemû karmend bi hev re nayên kar her car çend karmend tenê tên. Herwiha kelûpelên ku tên bikar aîn kîmawî ne xeteriya wan zêdeye lewma berpirsên kargehê nikarin ji cihên cûda bînin, niha jî tiştên di nav destê karmendan de heyî pê kar dikin lê dema ev kelûpel nemînin, kes nizane ku wê rewşa kargehê ber bi çi ve biçe.

### Armanca kargeha Roj alîkariya gel e

Kargeha Roj hat vekirin bi armanca alîkariya gel ji ber ku kelûpelên paqijiyê hemû ji jiderveyî bajar dihatin û bac li ser wan hebû û di encamê de bûhayê wan bilind bû. Lê dema tiştek ji hundirê bajêr de be wê gel jî sûdê jê bibîne û wê kargeh jî sûdê jê bigre. Lê mixabin hertim gelê me ji berhemên di hundirê bajar de nerazîne, daxwaza berhemên ji derveyî welat dikin. Lê bi demê re gel bi çavên xwe dîtin ku kargeh bi çi rengî kar dikin û qebûl kirinek li ser karê kargehê çêbû û kirîna gel ji kelûpelên kargehê re zêde bû. Kelûpelên paqijiyê yên kargeha Roj di milê qalîteya xwe de gelekî başe û di milê buha de jî ji buhayê sûkê kêmtire. Tişta ku bala gel dikşîne di kargehê de ku netenê bi kertonan kelûpel tên froştin dema kesek were bi kêlo yan jî yek yek jî bibe tu pirsgirêk li cem kargehê nînin.

### Karê çêkirina kelûpelên paqijiyê xwedî xeteriye

Karê çêkirina kelûpelên paqijiyê xeteriya wê li ser karmendan heye ji ber ku kelûpel kîmawî ne û hertim şewatê çêdike, lewma berpirsên kargehê hertim pêwîstiyên karmendan di milê cezme, mask û lepikan ji bo wan peyda dikin. Heger hin ji karmendan sedema van dermanan şewitîn jî berpirsên kargehê destek didin wan di milê tedawî kirina wan de jî. Kesê ku hesasî yan rebo bi wan re hebe nikare vî karî bike ji ber ku her tişt di kargehê de kîmawî ye. Niha jî hijmara jinan di kargehê de zêdetire ji ber ku di milê dagirtinê de sebra jinê zêdetire ji ya mêr. Tevî hemû şert û mercên ku herêm têre derbas dibe û ne hatina kelûpelan jî lê karmendên kargehê bi heman rihê ku di sala 2020’an de kar dikrin niha jî hewildanên xwe dikin û kar berdewam bibe. Pêwîste di bajar de kargeh zêdetir bibin da ku gel ne hewceyî jiderve be û girtina deriyên sînoran jî bandor li herêmê neke û di heman demê de jî derfetên kar jî zêde dibin ji bo gel.



# ‘Serkeftina pêvajoya aştiyê, rê li entegrasyona Rojava vedike’

Berpirsê Têkiliyên Giştî yên Navenda Firat ya Lêkolînan Welîd Çolî diyar kir ku entegrasyona li Rojavayê Kurdistanê bi pêvajoya li Bakurê Kurdistanê ve girêdayî ye û got, “Eger pêvajoya aştiyê pêş ve biçe, wê li Sûriyê jî entegrasyon pêş ve biçe.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê pêvajoya Bakurê Kurdistanê û pêvajoya Rojavayê Kurdistanê, herwiha di mijara entegrasyonê de stratejiya xwemijûlkirinê, Berpirsê Têkiliyên Giştî yên Navenda Firat ya Lêkolînan Welîd Çolî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:











**Rewşa Kurdan li Sûriyê, herwiha mûdaxeleya dewleta Tirk ji axa Sûriyê re û rawestandina wê li hember doza gelê Kurd, bi çi rengî ye?**

Pirsgirêka Kurd di Rojhilata Navîn de, pirsgirêkeke dîrokî ye û heta astekê tevliheve. Ji ber ku Kurdistan li ser çar welatan hat dabeşkirin, van çar dewletan jî herdem bi rêya odeyeke hevpeş û şidetê nêzî doza Kurd dibûn. Li hemberî vê siyasetê jî, li Kurdistanê şoreşên cuda pêk dihatin û bandor li hev dikirin, mînak ger li Rojhilatê Kurdistanê şoreşek pêk dihat, têkilî û bandora xwe li ser beşên din ên Kurdistanê jî hebû. Piştî salên 80’î ya ku herî zêde bandor li Rojavayê Kurdistanê kir, derbasbûna Tevgera Azadiyê ji Rojava re bû. Ji xwe Tirkiyê jî ne tenê li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, li dijî doza gelê Kurd disekinî, ew xwedî stratejiyeke ku li her derê dijmnatiya Kurdan dike û dibêje; Hebûn Kurdan li ser esasê tinebûna min e. Li ser vê bingehê her cihê ku tevgera Kurdan tê de hebû, Tirkiyê mudaxeleyî wê dikir. Di sala 1998’an de ji ber hebûna Tevgera Azadiyê li Rojavayê Kurdistanê, Tirkiyê artêşa xwe li ser sînorê Rojavayê Kurdistanê kom kir û hindik mabû ku şer li dijî Sûriyê bide destpêkirin. Piştî wê peymana Adana di navbera Sûriyê û Tirkiyê de hat îmzekirin. Piştî wefata Hafiz Eseed û hatina kurê wî Beşar Eseed li ser desthilatdariyê, ji salên 2000’î û şûn de li Sûriyê rewşeke din hat xuliqandin. Beşar Eseed siyaseta xwe li hemberî kurdan da guhertin û têkiliyên xwe bi Tirkiyê re di aliyê aborî, istixbaratî û siyasî de xurt kir. Herwiha di çarçoveya peymana Adana de, li dijî Kurdan plan hatin danîn, li ser esasê dijîtiya doza gelê Kurd, hemhengiyeke xurt di navbera Tirkiyê û Sûriyê de hebû, di encamê de bi sedan ciwanên Kurd li Sûriyê hatin girtin. Piştî sala 2011’an, bi destpêkirina Buhara Gelan, Tirkiyê siyaseta xwe da guhertin, wê dizanînbû ku projeyên nû li herêmê hene û rêjîma Baas wê bê rûxandin. Lewma di wê demê de Tirkiyê piştgiriya muxalefeta Sûriyê kir û ew muxalefet xist bin bandora xwe de, hem muxalefeta leşkerî û hem jî muxalefeta siyasî. Di vir de Tirkiyê dosya muxalefeta Sûriyê bi giştî xist bin destê xwe de. Di Sûriyê de gelê Kurd şoreşa 19’ê Tîrmehê di sala 2012’an de dan destpêkirin, Tirkiyê jî ev şoreş û bi giştî gelê Kurd li Rojava, ji xwe re kir armanceke sereke. Ji xwe Tirkiyê di stratejiya xwe de herdem Kurdan xeter dibîne. Di encamê de Tirkiyê muxalefeta Sûriyê li dijî Kurdan bikar anî. Tirkiyê ji di sala 2016’an de ji Bab û Ezazê dest pê kir û piştre dagirkeriya xwe fireh kir, di 2018’an de Efrîn û di 2019’an de Serêkaniyê dagir kir. Herwiha bi rêya balafiran gelek caran Rojava kir hedef. Bi wan êrîşan pêşengên civakê kir hedef, daku Rêveberiya xweser bê hilweşandin.

**Peymanên di navbera hikumeta demkî û QSD’ê de hatin îmzekirin çawa bûn û bi çi rengî hatin binpêkirin, peymana herî dawî ya 29’ê Çileyê li ser çi bingehê pêk hat?**

Li Sûriyê di sersala 2026’an de rewş hat guhertin. Ji ber ku di civîna Parîsê ya di navbera Îsraîl û hikumeta demkî de, esas Tirkiyê tenê wekî çavdêr bû, lê ew bi fermî tê de beşdar bû. Tirkiyê ji wir fermana şerê Şêxmeqsûd da, lewma şerê li dijî giştî Rojava hat destpêkirin. Tevî hebûna peymana di navbera QSD’ê û hikumeta demkî de, herwiha hebûna danûstendinan, hevpeymana li Şêxmeqsûdê ji aliyê hikumetê ve têk çû û bi beşdarbûna Tirkiyê êriş hatin pêkanîn, di encamê de Şêxmeqsûd kete destê hikumeta Demkî de. Di 18’ê Çileyê de agirbest hat ragihandin ku li ser esasê wê QSDê hêza xwe ji Dêrhafirê vekişîne, lê ji aliyê hikumeta demkî ve bêbextî çêbû, di encamê de bi sedan ciwanên me şehîd bûn û hatin dîlgirtin. Lê piştî serhildana Kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê û tevahî cîhanê, sînorek ji êrişên hikumeta demkî re hate dayîn. Piştî wê di 29’ê Çileyê de peymanek nû di navbera QSD’ê û hikumeta demkî de hat îmzekirin, ew peyman jî ne li gor xwestekan bû. Girêdayî peymanê jî ku li ser bingehê entegrasyona demokratîk e, lê hikumet bi nerîneke cuda nêzî entegrasyonê dibe, ev jî girêdayî rola Tirkiyê di Sûriyê de ye. Eger em li xalên peymana 29’ê Çileyê vegerin, pîvanên pêkanîna van xalan hebûn. Lê Tirkiyê nahêle ev pîvan pêk bên û girêdayî pêvajoya aştiyê ya li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, dike.

**Sedema sereke ku dewleta Tirk berê xwe da pêvajoya Aştiyê li Bakurê Kurdisatnê çi bû?**

Di demên berê de gelek caran agirbest di navbera Tevgera Azadiyê û Tirkiyê de çêdibûn û hin pêvajo dihatin destpêkirin, lê bi giştî bi rêya navbênkaran danûstandin dihatin kirin. Weke di salên 1997, 2005, 2006 û 2013’an de gelek pêvajo çêbûn, lê herdem Tirkiyê bi cidî li riyên çareseriyê meyze nedikir. Piştî 2023’an şerê Îsraîl û Hemas gur bû û li dijî Îranê jî êriş hatin destpêkirin. Tirkiyê nas kir ku rêjîma Eseed wê bê rûxandin û dor li ser wê û Îranê ye, ji ber wê xwest gavekê di aliyê doza gelê Kurd de biavêje. Li ser banga Rêber Abdullah Ocalan pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk di Sibata 2024’an de hat destpêkirin. Lê divê neyê jibîrkirin ku Tirkiyê her dem 2 rêyan li pêşberî xwe hildibijêre, ew jî rêya şer û rêya aştiyê. Dema rewşa wê aram be, şer hildibijêre û dema ku ew dikeve tengasiyê, behsa aştiyê dike. Lewra dema ku wê dît siyaseta guhertina Rojhilata Navîn nêzî wê dibe, wê berê xwe da “Pêvajoya Aştiyê” da ku xwe pê xelas bike. Ji destpêka pêvajoyê û heta destpêkirina şerî Amrîka-Îsraîl li dijî Îranê, Tirkiyê bi awayekî cidî nêzî pêvajoya aştiyê dibû û hişt heta astekê hevdîtin bi Rêber Apo re bên kirin. Lê di dema dawî de Tirkiyê bi sistî nêzî pêvajoyê dibe, tekezkirina li ser vê yekê ew e ku endamê Komîteya Navendî ya Hêzên Parastina Gel HPG’ê Murat Karayilan jî eşkere kir ku Tirkiyê pêvajo çemidandiye. Lê li şûna çemidandina pêvajoyê, pêwîst bû bi pêvajoyê re li Tirkiyê entegrasyona demokratîk dest pê kiriba, zagon bihatana guhertin û taybetmendiyên herêmên Kurdî bihata destnîşankirin, lê xuyaye heta niha Tirkiyê ji van gavan re ne amade ye.

**Girêdana pêvajoya Bakurê Kurdistanê bi rewşa Rojavayê Kurdistanê re çi ye?**

Rewşa Rojavayê Kurdistanê bi rewşa Bakurê Kurdistanê ve girêdayî ye, eger li Bakur rehetî çêdibe li Rojava jî çêdibe. Mînak; piştî destpêkirina pêvajoya aştiyê li Tirkiyê, êrişên Tirkiyê yên ezmanî li dijî Rojavayê Kurdistanê rawestiyan. Sekna pêvajoyê jî, niha bandora xwe li ser Rojavayê Kurdistanê dike. Ji aliyê hikumeta demkî ve gelek xetên sor tên derbaskirin û hewil dide li Sûriyê tevahî, sîstema navndiyeke hişk bide meşandin. Eger entegrasyon bi rengekî rast neyê pêkanîn û gerantoreke navnetewî jê re tune be, kes nizane wê encama çi be. Kurd di Sûriyê de netewa duyemîne, li gorî wê pêwîst e herêmên Kurdan xwedî taybetmendî bin, sazî bi zimanê Kurdî bin, di ware çand û perwerdeyê de jî, zimanê Kurdî fermî be. Lê tê xuyakirin niyeta hikumetê nezelal e, hikumeta demkî dixwaze her tiştî li Sûriyê bixe bin kontrola xwe. Ev rewş jî girêdayî pêvajoya Aştiyê ye. Eger pêvajoya aştiyê pêş ve biçe, wê li Sûriyê jî entegrasyon pêş ve biçe. Eger em li xalên 29’ê Çileyê vegerin, pêwîs e hikumeta demkî zimanê Kurdî ji pankêta saziyan ranekiriba, ya duyem xala koçberan e, pêwîst e li gorî peymanê koçber di demeke kin de vegerin male xwe, lê ev jî bi sistî ji aliyê hikumetê ve tê kirin. Heta niha hikumetê tu gave berbiçav neavetin. Ji xwe rewş giştî bi hev e girêdayî ye. Rewşa Rojavayê Kurdistanê bi Bakurê Kurdistanê ve girêdayî ye, rewşa Bakur jî bi rewşa Rojhilata Navîn û giştî cîhanê ve girêdayî ye. Tirkiyê li benda şerê Îranê ye û Îran wekî eyînikê ji xwe re dibîne û dibêje; Eger Îran bi ser ket, ez jî bi ser dikevim, ji ber vê yekê ew bi sistî nêzî pêvajoyê dibe û li benda rewşa şerê Îranê ye. Li aliyê din siyaseta Amrîka jî nema zelal e. Serokên Amrîka her gav daxuyaniyekê bi rengekî tersî hev dide. Tirump li cihekî dibêje me çek radestî Kurdan kir, da ku rêjîma Îran rûxînin, lê Kurdan çek ji xwe re birin, ev jî ji rastiyê dûr e. Ji ber vê nezelalbûnê, dibe ku Amerîka tiştin xerab li herêmê bike. Ji xwe li herêmê sê hêzên sereke hene û her yek jî li gorî berjewndiyên xwe dimeşin, ew jî Amerîka, Îsraîl û Tirkiyê ne. Di vir de Tirkiyê û Îsraîl ji hev ditirsin, herî zêde Tirkiyê hesaban ji Îsraîlê dike. Lewma heger entegrasyon pêk bên, wê rê li ber şerên mezin bên girtin.

# Peymana Qesra Şêrîn; Xencera ku Kurdistan kir du parçe

387 sal di ser peyamana Qesra Şêrîn re derbas bûn. Peymana ku bi destê Osmanî û Sefewiyan Kurdistan kir du parçe, derî ji Lozan û Saykes-Picot re vekir ku bi dehan komkujî derheqê gelê Kurd de bên kirin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Peymana Qesra Şêrîn

Di 17'ê Gulana sala 1639'an de, Peymana Qesra Şêrîn di navbera Osmanî û Sefewaiyan de hate îmzekirin, ev peyman yekemîn parçekirina xaka Kurdistanê bû ku her du dewletan di navbera xwe de dabeş kirin. Peymana Qesra Şêrîn piştî ew qas pêlên çûn û hatina şerên herdu dewletan û cara dawî bi zeftkirina Bexdayê ji bal osmaniyan ve hat mohrkirin. Sultan Murad bi xwe piştî serkeftinê zû vegeriya Îstanbulê, wezîrê ezemê xwe hişt ji bo guftûgoyan û lihevkirinê. Li alî Îranê wekîlê Şah Safî Sarû Xan bû. Orduya Osmanî li Zohabê danîbû. Sarû Xan tevî maiyeta xwe hatibû qerargeha orduya Osmanî. Li alî Osmaniyan, Sadrezam û serdarê orduyê Kara Mustafa Paşa hebû. Peyman li xîveta Sedrezem hat îmzakirin. Li dora sedrezem mîrêmîranên Kurdistanê û yên Osmanî, rîsipî û mezinên Yenîçeriyan hebûn. Li gel Sarû Xan ê wekîlê Şah jî elçiyê destpêkê Mîraxurê Şah Mehemedqulî amade bû. Peyman di saet 4'ê piştî nîvro de ji aliyê mîr Kara Mustafa Paşa û Sarû Xan ve hat mohrkirin. Wekîlê Şah, doza vegerandina Kela Qersê kir, lê mîr qebûl nekir. Piştî minaqeşeyên dijwar biryar wiha hat dan: Ji eyaleta Bexdayê Hassan, Bedre, Mendelcîn (Mendelî), Derne, Derteng heta Sermenelê ew çolistanên ku di navbera wan de dimînin, qebîleyên Ziyauddîn û Harûnî yên eşîra Cafan, gundên li rojavayê Kela Zencîrê û çiyayên li rajora Kela Zalim Elî ya nêzî Şarezorê; quntarên wan ên li vê keleyê nerî, heta ku digihe geliyê ber bi Şarezorê ve vebûyî, Qizilce Qele û derûdorên bi ser wê ve ê ji bal Padîşahê Osmanî ve bên zeftkirin. Ji bilî van, Axiska, Qers, Wan, Şarezor, Bexdad û Besra, hemû kele, welat, nahiye, erd(erazî), çiya û girên di nav wan de, ê tu carî ji aliyê şah ve tûşî êrîşê nebin û keleyên ji Mendelicinê (Mendeliyê) heta Dertengê, Bîre, Zezduvî (ku Zemrud Me'wa jî tê gotin), gund, kele, daristanên rojhilatê Kela Zencîrê û cihên ser bi wan ve, Mihriban (osmaniyan ji Merîwanê re digot. MC û cihên ser bi wê ve ê di destê şah de bin. Osmanî yê dest nedin cihên di nav wan deveran de. Kela Zincîrê, keleyên Koturê û Makuyê, yên ser sînorê Wanê û keleha Magazberd ya li alî Qersê ê ji bal her du terefan ve bên hilweşandin. Peymana morkirî merivekî elçiyê Şah Mehmedqulî girt da ku bigihîne Şah Safî ku ew wê mohr bike. Sê roj dem hat dayîn. Di hundurê çar rojan de Şah Safî peyman mohr kir û ew vegeriya. Mehmedqulîyê elçiyê Şah ew girt da bibe Istanbolê ji bo morkirina Sultan Muradê IV'ê. Roja pêşî, sedrezamê Osmanî ziyafeteke mezin da heyetên herdu aliyan. Roja duyê Saru Xan ziyafeteka mezin da. Piştre Sarû Xan ber bi Şah ve bi rê ket. Mehmedqulî li gel orduya osmanî ma da ku biçe Istanbolê ji bo mohrkirina sultan. Ew berî orduyê bi rê ket, ordu jî di pey re dest bi vegerê kir. Mehmedqulî di 19'ê Îlona 1639'ê de gihaşt Istanbolê, bi şertê ku li ser Bexdayê doza tu mafî neke, Rewan ji Şah re hat berdan û bi merasimeka muezzem, Muradê IV'ê peyman mohr kir. Elçî ew girt û vegeriya welatê xwe. Bi vî awayî Osmaniyan û Îraniyan ji 1514'ê bi vir de dawî li şerên wek pêlên Med û Cezîrê ên deryayê yên nêzî 125 salan anîn. Li herdu aliyan jî serhedên van dewletan qadên şerên wan Kurdistan bû, li her du aliyan ew di bin piyên du orduyên gelek mezin de pêpes dibûn, dihat talankirin. Xan û mîrên Kurdistanê ji neçarî li herdu aliyan tevî orduyan dibûn, dihatin hemberê hev, gelek can û mal didan. Wek nimûne di sefera sala 1625 heya 1926'ê ya ser Bexdayê ya bi serdariya Hafiz Ahmed Paşa de heft mîrên Kurdistanê beşdar bûbûn; Mîrê Hezoyê Şeref Xan, Mîrê Egilê Mu'mîn Xan, Mîrê Tercilê Îbrahîm Beg, Mîrê Paloyê Hesen Beg, Mîrê Erxeniyê Alî Begê Başibuyukzade, Mîrê Xarpêtê Îbrahîm Beg û Mîrê Îmadiyê Seyid Xan beşdar bûn.

### Berdewamiya peymanan: Zincîra komkujiyan

Peymana Qasra Şîrînê û Lozanê, di sedsala 20'an de rê li ber qirkirinên mezin vekir. Dewletên ku Kurdistan parçe kirine, ji bo ku vê perçebûnê biparêzin, bi tifaqên hêzên hegemon ên cîhanê û piştgiriya wan li dijî Kurdan komkujî pêk anîn. Komkujiyên wekî Geliyê Zîlan, Dêrsim, Helepçe, Enfal, Roboskî û Şengalê, encamên rasterast ên wê feraseta qirker, bê statu û perçekirî dihêle ne. Helbet her gava li dijî Kurdan hatiye avakirin tenê bi çend serokeşir û deroran re hat pêkanîn. Civaka Kurd a derveyî dewletê û desthilatê maye li dijî vê yekê hem bîreweriya xwe xurt kir, hem jî ji bo parastin û hebûna xwe ket lêgerînên hebûnî.

### Rêber Apo: Çareserî Neteweya Demokratîk e

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, destnîşan dike ku peymanên mîna



Qasra Şîrînê û Lozanê, bi polîtîkayên qirkirinê hatine kûrkirin. Li gorî Rêber Abdullah Ocalan, bersiva herî mezin a li dijî vê dîroka reş, avakirina Neteweya Demokratîk e. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tîne ziman ku yekîtiya Kurdan ne bi dewletên neteweyî, lê bi vîna gelan û jiyana komîn a ku sînoran bêwate dike, pêkan e. Neteweya Demokratîk ne tenê modeleke siyasî, lê bersiva dîrokî ya li dijî polîtîkayên qirkirin û perçebûnê ye. Ji bo ku Kurd careke din nebin qurbana komplo û komkujiyên nû, pêwîstiya herî jiyanî yekîtiya di bin banê vîneke hevpar de avakirin e û pergaleke demokratîk li her qadeke jiyanê de rêxistinkirin e. Tenê bi yekîtiyê, dê sînor û dîwarên ji Qasra Şîrîn ber bi îro di navbera gel û baweriyan hatine avakirin, werin rûxandin.

### Piştî 387 salan ji peymana Qesra Şêrîn divê Kurd çi bikin?

Peymana Qesra Şêrîn ne tenê peymaneke navbera Osmanî û Sefewiyan bû, di heman demê de destnîşana qelsbûna cihê Kurdan di nav şerên herêmî de bû. Kurdistan gelek caran bû qada şerê dewletên mezin, bajar û gund hatin talankirin û gelê Kurd di navbera berjewendiyên siyasî yên derveyî de ma. Lê di sedsala 21'ê de şert û merc guhertine. Îro ji bo parastina destkeftiyên Kurdan û dûrketina ji şerên Rojhilata Navînê, pêwîst e ku Kurd bi hişmendî, yekîtî û stratejiyeke demdirêj tevbigerin. Yek ji girîngtirîn gavên ku Kurd divê bikin, avakirina yekîtîya neteweyî ye. Di dîrokê de gelek caran nakokiyên siyasî yên partiyan bûne sedema qelsbûna Kurdan. Dema ku hêzên derveyî li ser herêmê planan dikin, her netewe ku nikare di nav xwe de yekrêziyê ava bike, bi hêsanî dikeve bin bandora wan, nexasim dewletên dagirker ên Kurdistanê. Ji ber vê yekê, pêwîst e ku partî û hêzên Kurdî berjewendiyên neteweyî li ser berjewendiyên kesane û partiyan bilindtir bikin. Yekbûna helwest û armancan dikare Kurdan di nav siyaseta herêmî û navneteweyî de bihêztir bike. Di heman demê de, Kurd divê dûrî şer û pevçûnên hêz û dewletên hegemon bikevin. Rojhilata Navînê niha jî qadê gelek şer û aloziyên siyasî ye, nemaze şerê Îran û Israîl-DYA. Her şerek ku di herêmê de çêdibe, yekem car li ser welat û bajarên Kurdan bandor dike, nimûne Başûrê Kurdistanê zerera herî mezin ji êrişên Îran û Amerîka-Israîlê dît. Ji ber vê yekê, riya çareseriyê ew e ku Kurd rêya diyalogê, aştiyê û danûstandinan hilbijêrin. Heger Kurd bibin alîyek ji şerên dewletên mezin, dîsa dikarin wekî demên berê bibin qurbaniya pevçûnan. Li gel van pêşxistina aboriya civakî, zanistî, xwerêxistinkirin û xweperwerdekirin gelekî girîng e. Neteweyek ku xwedî bîrwerî û zanîneke pêşketî be, perwerdehiya baş û aboriyeke serbixwe be, dikare bi hêsanî mafên xwe biparêze, hem jî dûrî peyman û planên hegemoniyê bibe. Di sedsala 21'ê de hêz tenê bi çek û leşkerê nayê pîvandin, lê belê siyaset, zanist, pêşxistina teknelojiya û aboriya bêzerer jî hêzên sereke ne. Ji ber vê yekê, pêwîst e ku Kurd zêdetir li ser perwerdehiya ciwanan, zanist, medyayê û avakirina saziyên demokratîk bixebitin. Ji aliyê din ve, pêwendiyên baş bi cîhanê û gelên cihêreng ava bikin. Dîplomasî dikare gelek caran ji çekan bihêztir be. Kurd divê maf û doza xwe bi rêyên siyasî û qanûnî bidin naskirin. Parastina mafên mirovan, demokrasiya û aştiyê dikare piştgirîya cîhanî ji bo Kurdan zêde bike. Li Rojava û Bakur di pêvajoyeke girîng û hestyar re derbas dibin, pêvajoyeke ku hewldanê dike mafê gelê Kurd di destûrê demokratîk de were parastin. Li Başûr jî di nava Îraqê de xwedî sîstemeke fedral a demokratîk e, li Rojhilatê Kurdistên doza mafê Kurd di nava civaka Îranê de rojeveke girîng e, herwiha têkoşîn ji bo vê yekê tê kirin. Di qonaxeke wiha hestiyar de divê li her çar parçeyan aliyên siyasî yên Kurdî yekîtiyeke xwe bi riya lidarxistina kongreya neteweyî ava bikin da ku têkiliyên niştîmanî xurttir bibin û gelê Kurd bi rengekî demokratîk bi gelên din re bijî.



**E.Pêjder Altan**

## Nexşeya nû ya şikestoka Tirkiye-Îsraîl

Her çiqas pêvçûna berjewendî yê di navbêra Tirkiye û Îsraîlê de kûr dibe, stratejiya heremî ya dewleta Tirkiyê qada Sûriyê û Iraqê dizivrîne qadeke hesabpirsînê. Ji HTŞ heta ENKS'ê, ji pelê Dûrzî heta grûbên biyanî, hemû tişt herî dawî li ser şerê nû ya herêmî tê avakirin.
Di Rojhilata Navîn de ku hevsengiyên nû tên avakirin, pêvçûna berjewendiyên dewletên Tirkiye û Îsrail jî bi awayek berbiçav tê dîtin. Encama herî krîtîk a vê pêvçûnê jî, dewleta Tirkiye di ser MÎT'ê de dixwaze Iraq û Sûriyê veguhezîne qada hesabên xwe yên ku li malê çêkiriye. Rastiyek heye ku Enqere, piraniya mekanîzmaya biryardayînê ya Hikumeta Demkî ya Şamê xistiye bin kontrola xwe. Hewil dide heman modelî di Iraqê de jî ava bike. Ev wêne, di asta agahiyekê nû ya ku dê paşeroja heremê diyar bike ye.
Ji ber ku dewleta Tirkiye dixwaze li dijî Îsraîlê bi armanca cebheyekê parastina heremî ava bike, di cihekê de hêzên Şiî û Sûniyan bide şer kirin û di cihekê de jî wan di bin banekê de kom bike.
Di vê çerçoveyê de; serdana berdevkê Haşdî Şabî ya li Enqereyê, helwesta xwe ya li dijî Hizbûlahê nermkirin, di ser Hikumeta Demkî ya Şamê de bi Iraqê re têkiliyên nû avakirin, ne tesadufin. Ev hemû stratejiya nû ya heremî ya MÎT'ê ye.
Ev hewildan, gelo ji bo ku Tirkiye xwe nêzî eksena Îrane bike an na? Baş nayê zanîn lê, yê ev vekirî diyar dibe ku Tirkiye li dijî Îsraîlê "Siyaseteke hevsengî ya bi kontrol" ava bike ye.
Baş e li hemberê vê stratejiyê Îsraîl çawa tevdigere? Li gor agahiyên ji qadê tên, di nirxandinên MÎT'ê de diyar dibe ku Fransa û Îsraîl bi taybetî li ser du dosyayan dixwazin bandora dewleta Tirk a di Sûriyê de bişkênin. Ev her du dosya; mijara civaka Dûrziyan a di herêma Suweydayê de, ya duyemîn jî dosyaya komên çete yên biyanî yên di bin banê dewleta Tirk ên başûr û bakurê Sûriyê de ye. Dewleta Tirk jî li dijî vê yekî, di ser MÎT û Sefîrê Tirkiye ya Şamê Nûh Yilmaz ku berê berpirsiyarekê MÎT bû de, du planan dimeşîne.
Yekemîn; civaka Durziyan entegreyê saziyên dewleta an go hikumeta Şamê bike û bixe bin kontrola xwe.
Duyemîn jî; di nava civaka Durziyan de parçekirina mezhebî çêbike û di cihê yek rêberekî de pir rêhberî ango ji yekê zêdetir fîgurên olî destek bike.
Ev jî di lîteratura lîstîkên dewletan de jêre tê gotin stratejiya "civakê atomîze bike û birêve bibe" ye.
Mijara HTŞ û grubên biyanî jî; senaryoyek şer a demkurtî ye. Ji ber her diçe zextên navneteweyî ya li ser komên biyanî yên li Idlibê zêde dibin, hikumeta Demkî ya Colanî jî tengav dibe. MÎT jî ji bo vê zextê belav bike, senaryoyek pêvçûnê yê bi kontrol xistiye meriyetê.
Mînak, di 6'ê gulanê de hêzên girêdayên Hikumeta Demkî ya Şamê ku operasyonek demkurt a li dijî komên biyanî yên li Idlibê, nîşaneya destpêka vê senaryoyî bû. Bi van cûre pêvçûnên xapandinê, dixwaze hem dewletên Rojavayî biawqîne hem jî hevsengiyên navxweyî ya HTŞ'ê ji nû ve ava bike.
Lîstikên entegrasyonê yên HTŞ'ê û dewleta Tirk, her wiha ENKS'ê jî xistina nava vê lîstîkê jî, bila bibe mijara nivisekê din.



# Rizîna mêjî... Dema ku ekran dibin barek li ser hiş

Di salên dawî de, cîhan di qadeke dîjîtal a vekirî de dijî ku qet dev ji hilberandina naveroka bilez, kurt û vala bernade. Bi belavbûna girseyî ya telefonên pêşketî û platformên medya civakî re, têgeheke nû derketiye holê ku hem nakok e û hem jî fikaran çêdike; Ew jî 'Rizîna Mêjî- Brain Rot' e.

**Zana Roj**

Her çendî ev têgeh teşxîseke fermî ya bijîşkî nebe jî, ew bi berfirehî ji bo danasîna rewşek westandina derûnî, bêhişbûn û kêmbûna konsantrasyonê (terkîz) ku ji ber bikaranîna zêde ya naveroka dîjîtal a bilez, nemaze vîdyoyên kurt û nivîsên dubarekirî yên ku rojane di jiyana mirovan de dagir dikin, çêdibe, tê bikar anîn.
Medya civakî êdî ne tenê amûrek ji bo ragihandinê ye; ew bûye beşek girîng ji jiyana rojane ya bi mîlyonan kesan li çaraliyê cîhanê. Bi saya bernameyên mîna TikTok, Instagram û YouTube, bikarhêner niha demjimêrên dirêj temaşekirina naveroka bilez û domdar derbas dikin.
Pisporên psîkolojî û tevgerên dîjîtal destnîşan dikin ku ev cure naverok bi kişandina balê ji bo demên pir kurt ve girêdayî ye ku dibe sedem ku mêjî bi leza û tevgera domdar re rabe. Her wiha piştre zehmetî dibîne ku li ser karên dirêj ên wekî perwerde, xwendin, an jî fikrandina kur, bisekine.

### Rizîna Mejî çawa dest pê dike?

Ew pir caran bi awayekî sade dest pê dike; çend deqe geroka li ser telefonê dikare bibe demjimêrên dirêj ên temaşekirina bênavber. Bi demê re, hiş fêrî wergirtina bilez ên şahî û agahdariyê dibe, bêyî ku dem ji bo hizirkirin an analîzkirinê bide.
Pispor bawer dikin ku mejiyê mirov ji bo mijûlbûna bi vê mîqdara mezin a teşwîqên dîtbarî û bihîstinê yên bilez ên rojane nehatiye dîzaynkirin ku ev jî dibe sedema rewşek têrbûna derûnî û westandina derûnî. Pirbûna agahdariyan û guheztina bilez di navbera bernameyan de jî dibe sedema kêmkirina şiyana balkişandin û konsantrekirinê ji bo demên dirêj.

### Bandorên psîkolojîk û tevgerî yên zêdebûyî

Bandorên "rizîna mêjî" ne tenê bi balkişandinê ve sînordar in; ew digihîjin gelek aliyên psîkolojîk û tevgerî. Gelek kes niha ji bilî hewesa domdar a kontrolkirina telefonên xwe, ji balkişandina kêm, jibîrkirin û bêzariya bilez, dikişînin.
Girêdana berdewam bi naveroka kurt re, bi taybetî di nav ciwan û zarokan de, bûye sedema kêmbûna eleqeya ji bo xwendin û çalakiyên rewşenbîrî. Mixabin ji bo gelek kesan, şiyana rûniştina bêdeng bêyî karanîna telefonê dijwar bûye.
Pispor hişyar dikin ku bikaranîna zêde ya medyaya civakî dibe ku bi zêdebûna asta fikar, stres û têkçûnên xewê ve girêdayî be, bi taybet dema ku karanîna telefonê heta derengiya şevê dirêj dibe.

### Zarok û ciwan faktora herî bandordar e

Zarok û ciwan ji ber pêşveçûna domdar a mêjiyên wan di vî temenî de, herî zêde ji bandorên vê tevgera dîjîtal re xeternak in. Bikaranîna zêde ya ekranê dikare bandorek neyînî li ser balkişandin, performansa perwerdê û şiyana têkiliya civakî bike.
Perwerdekar destnîşan dikin ku hin zarok ji ber encama bi naverokên bilez û her tim diguherin re rû bi rû ne, di şopandina dersan an xwendina nivîsên dirêj de zehmetiyan dikişînin. Çalakiyên kevneşopî yên wekî lîstika komî, xwendin û xêzkirinê jî kêm bûne, û li şûna wan demjimêrên dirêj li ber ekranan derbas bûne.



### Ma ew nexweşiyeke rastî ye?

Her çiqas têgîna "rizîbûna mêjî" bi berfirehî were bikaranîn jî, ew wekî nexweşiyeke bijîşkî ya fermî nayê hesibandin, lê wekî îfadeyeke metaforîk (mecazî) tê bikaranîn ku rewşeke westandina derûnî û bandorên neyînî yên ji ber bikaranîna zêde ya naveroka dîjîtal çêdibin, vedibêje.
Lê pispor piştrast dikin ku bandorên ji vê yekê derdikevin rast in û dibe ku bandorê li tenduristiya derûnî, hilberîn û şêwaza jiyanê bikin, bi taybet heke ku kesek demjimêrên dirêj bêyî hevsengiyê amûrên elektronîkî bikar bîne.

### Çawa dikare ev diyarde were çareserkirin?

Pisporên tenduristiya derûnî bawer dikin ku çareserî ne di terikandina tevahî ya teknolojiyê de ye, lê di bidestxistina hevsengiyek saxlem di karanîna wê de ye. Li gor wê di nav gavên herî pêşniyarkirî de ev hene:
Bikaranîna rojane ya telefona xwe kêm bike, demên taybet ji bo medyaya civakî destnîşan bike, spor û çalakiyên li derve bike, pirtûkên xwe bixwîne an jî hobiyên ku hewceyê balkişandinê ne bişopîne, bêyî ekranê têra xwe razên, agahiyên nehewce vemirîne, her roj ji bo bêhnvedan û rihetiya derûnî dûrî înternetê dem veqetîne.

### Di navbera sûd û nexweşiya pêvegirêdanê de

Nayê înkarkirin ku teknolojî û medyaya civakî ji bo mirovahiyê feydeyên mezin peyda kirine, ji hêsankirina ragihandinê bigire heya belavkirina zanînê û gihîştina bilez a agahdariyê, lê karanîna zêde û bê rêkûpêk dibe ku van amûran veguherîne barekî derûnî û psîkolojîk.
Di serdemekê de ku ekran her kêliyê bi mirovan re ne, pirsgirêka rastîn ew e ku meriv çawa teknolojiyê bi hişmendî bikar bîne, bêyî ku ew bibe amûrek ku bala mirovan dikişîne û şiyana fikirîn û konsantrekirinê lawaz dike.
Ji ber vê yekê, "rizîna mêjî" ne tenê peyveke modayî ya înternetê ye, lê peyameke hişyariyê ye li ser şêwazeke jiyana dîjîtal a bilez ku dibe bi bêdengî bandorê li hişan bike, bi taybet di nav nifşên nû de ku di cîhanek her tim nîşan dide naverok û agahdariyan 24 saetan de radiweste, mezin dibin.
Di yek ji mezintirîn lêkolînên ku di kovara "PNAS Nexus" de hatiye weşandin, zêdetirî 467 beşdarên temenê wan navînî 32 salî bûn. Lêkolîneran dîtin ku tenê durketina 14 rojan ji bikaranîna internetê li ser telefonên pêşketî, dibe sedem ku mirov ji vê diyardeyê dur û rihet bibe û piskeolojiya wan baştir bibe.

### Gotina dawî…!

Ev diyardeyên ku derdikevin, ne jixweber ve derketine û weke ku cîhan ne di ferqa wê de ye. Sîstema sermeyadar û modernîteya kapîtalîst bi nêrandina xwe ya pêşerojê ya bi deh salan, wan ev yek bi zanebûn û sîstematîk afirandine û danîne ber destê me. Sîstema vîdyoyên kurt ku dirêjahiya wê deqeyekê derbas nake, ev polîtîkayeke bi zanebûn li ser mejiyê mirovan hatiye amadekirin. Ev yek bi armanca ku mejiyê însanan bi demê re ji tiştekî yek deqeyî zêdetir raneke û nexebite. Ev yek ne tenê bandorê li ser zarokan dike, bi demê re bandorê li ser hemû mejiyê mirovahiyê bi hemû temenên xwe dike. Lê ya herî bi tehlûke zarok û nifşên nû ne helbet.
Wê bi demê re bibe sedem ku em xwe bêyê têknolojiyê, hişê çêkirî û medyaya civakî, nehizirin. Ger em di vê sedsalê de hinek xwendin, pirtûk û analîzan dikin, wê di demê pêş de, ev yek bi temamî ji holê rabe. Ya xiraptir wê mêjiyê mirov bikeve rewşa rawestandin û cemdandinê.

# Vîna wî ji nexweşiyê xurtir e

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Ciwanê 22 salî yê bi nave Diyar Ebdullrehman tevî ku nexweşê telasîmyayê ye jî, lê ew bi vîneke mezin alîkariya hevalên xwe yên nexweş di nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd de dike. Ew hem xwîna xwe diguhere û hem jî di guhertina xwîna hevalên xwe de dibe alîkar.**

Telasîmya nexweşiyeke xwînê ya wîrasî ye ku ji dê û bavan derbasî zarokan dibe, ev nexweşî dibe sedema kêmbûna hemoglobînê û hewcedariya nexweş herdem bi



xwînê heye. Tûşeyên vê nexweşiyê jî jiyana wan kurt e. Yek ji wan nexweşên telasîmyayê ku li Nexweşxaneya Heyva Sor A Kurd a Qamişlo tê îlackirin jî, ciwanê bi navê Diyar Ebdullrehman e.
Diyar Ebdullrehman temenê wî 22 sal e, ew ji temenê 3 mehî ve bi vê nexweşiya giran ket. Di nava malbata wî de jî birayê wî yê 11 salî bi vê nexweşiyê ye.
Diyar ji bo ku dema xwe derbas bike, êşa xwe ji bîr bike û bi hevalên xwe yên nexweş re bibe alîkar, weke xebatkarekî tenduristiyê 2 sal in di nexweşxaneya Heyva Sor A Kurd e kar dike. Ew ne bi fonan kar dike, lê wekî alîkariyê dike.
Di destpêka karê xwe de Diyar perwerdeya lênerînê li nexweşxaneyê qedand, ji ber jêhatîbûna Diyar ew di demeke kurt de fêrî perwerdeya lênerînê bû û cihê xwe di nexweşxanê de girt. Diyar her 15 yan jî 20 rojan xwîna xwe dughere û bijîşk bi dermanên cuda wî tidawî dikin. Dema ku laşê Diyar daxwaza xwînê dike ew xwîna xwe dughere.
Diyar her roj ji seat 8 ê sibehê bi dilekî kêfxweş berê xwe dide nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd heya 6 ê êvarî li wir kar dike. Tevî ku Diyar nexweşe jî lê bi hevalên xwe jî difikire ku here alîkariya hervalên xwe jî bike. Ew dema ku diçe nexweşxaneyê jî bi hêzeke mezin karê xwe dide meşandin. Diyar û heşt hevalên xwe yên din bi hev re xwîna kesên bi nexweşiya Telasimyayê dugherin. Her roj nexweşxaneya Heyva Sor 15 kesan yan jî 20 kesên nexweş pêşwazî dike, ji ber wê jî Diyar her tim di tevgerê de ye, da ku xwîna nexweşan biguhere.
Diyar ne weke her kesekî bi nexwşiya Talasîmyayê jiyan dike, lê ew weke her kesekî nûrmal jiyana xwe derbas dike. Diyar bi kêfa xwe alîkariyê bi nexweşxaneyê re dike tevî ku Diyar nexweşe jî, lê di heman demê de kêfxweşe jî ku kar dike. Ew hêvî dike ku nexweşxaneyeke din vebe ku her tim xwîn lê peyda bibe, ne tenê ji bo nexweşiyên Telasîmya lê belê ji bo gelek nexweşiyên din jî. Ji ber Diyar ne tenê bi nexweşiya xwe difikire, lê belê bi hemû kesên bi nexweşiyên din jî difikire.